



**K.T**

**ZANÎNGEHA MÊRDÎN ARTUKLUYÊ**

**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LÎ TIRKÎYEYÊ**

**ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Projeya Lîsansa Bilind ya Bêtez**

**BERHEVKIRINA HÊMANÊN FOLKLORÊ**

**LI GUNDÊ QEREKOYINÊ YÊ GIRÊDAYÎ SÊWREKÊ**

**Argeş BÎRGUN**

**21721008**

**Şêwirmend**

**Doç. Dr. Necat KESKÎN**

**Mêrdîn - 2023**

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisans Üstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Berhevkirina Hêmanên Folklorê Li Gundê Qerekoyinê yê Girêdayî Sêwrekê” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylıyorum. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinde erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

13.01.2023

Argeş BİRGÜN

## KABUL VE ONAY

Argeş BİRGÜN tarafından hazırlanan “*Berhevkirina Hêmanên Folklorê Li Gundê Qerekoyinê yê Girêdayî Sêwrekê*” adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **TEZSİZ YÜKSEK LİSANS PROJESİ** olarak oybirliği/oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Necat Keskin (Danışman)

.....

Doç. Dr. Mustafa Öztürk (Üye)

.....

Doç.Dr. Mustafa Aslan (Üye)

.....

Doç. Dr. Ahmet Kırcan

Enstitü Müdürü

## NAVEROK

<b>TAAHHÛTNAME</b> .....	<b>i</b>
<b>KABUL VE ONAY</b> .....	<b>ii</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>iii</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>v</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>vi</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>vii</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>viii</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
Mijara Xebatê û Sînorên Wê .....	1
Armanç û Girîngiya Xebatê .....	1
Rê û Rêbazên Xebatê .....	2
Pirsgirêkên Xebatê .....	3
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	<b>4</b>
<b>AGAHIYÊN DERBARÊ GUND</b> .....	<b>4</b>
1.1. Agahiyên Derbarê Gund û Navê Gund .....	4
1.2. Nasnameya Etnîk a Gund .....	5
1.3. Aboriya Gund .....	6
<b>BEŞA DUYEM</b> .....	<b>7</b>
<b>JİYANA ÇANDÎ YA GUND</b> .....	<b>7</b>
2.1. Kevneşopîyên wek mihrîcanan(festîval) .....	7
2.1.1. Serê Salê .....	7
2.1.2. Newroz.....	7
2.2. Ziyaret û Çîrok û Bawerîyên Girêdayî Ziyaretan ên li gund.....	8
<b>BEŞA SÊYEM</b> .....	<b>10</b>
<b>ORF Û ADETÊN GUND ÊN BERÊ Û YÊN NIHA</b> .....	<b>10</b>
3.1. Jidayikbûn .....	10
3.2. Navlêkirina Zarokan.....	10

3.3. Zewac – Daweta Berê.....	16
3.4. Zewac – Daweta Niha .....	17
3.4. Mirin – Şîn.....	29
<b>BEŞA ÇAREM .....</b>	<b>30</b>
<b>TIBBA GELÊRÎ.....</b>	<b>30</b>
4.1. Tibba Gelêrî li Gund, Nexweşîyên Tê Zanîn û Navên Wan ên Herêmî.....	30
<b>BEŞA PÛNCÊM .....</b>	<b>34</b>
<b>LÎSTIKÊN GELÊRÎ.....</b>	<b>34</b>
5.1. Lîstik (Zarok/Mezin) .....	34
6.1. Metodên ji bo destpêka lîstikan.....	35
<b>BEŞA ŞEŞEM.....</b>	<b>44</b>
<b>EDEBİYATA GELÊRÎ .....</b>	<b>44</b>
6.1. Çîrok û Meseleyên di civatê de tê behskirin. ....	44
<b>ENCAM.....</b>	<b>56</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>57</b>
<b>PÊVEK:.....</b>	<b>59</b>

## KURTE

Projeya Lîsansa Bilind ya Bêtez

Berhevkirina Hêmanên Folklorê Li Gundê Qereqoyinê yê Girêdayî Sêwrekê

Argeş BÎRGÛN

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

77: Rûpel

Ev xebat li gundê Qereqoyinê(Karakoyun) yê girêdayî Sêwrekê hatiye kirin. Ev xebat parçeyekî xebatên monografîyê ye, lê belê bi tevahî ne monografî ye. Ji ber pirsgerokên kêmasîya demê, çûn û hatinê ev xebat nebû monografîyeye giştî.

Ji ber ku li vî gundî xebatên wek vê çênebûye, me hewcedarî dît ku divê xebatên sehayê li vî gundî were kirin, ji ber ku ev gund ji gelek alîyan de li Sêwrekê cihê xwe girtîye, ji alîyê çandî, edebî, sîyasî û aborî de bi bandor e. Li gor hevpeyvînên me derdorê 30-40 sal berê li gund dengbêj û çîrokbêj hebûne, lê belê stranên û çîrokên wan bêtir bi jîyana wan ve sînordar mane, armanca me berhemên mayî berhevkirin û qeydkirin e. Ji alîyê din de jî ji ber pergala kapîtalîst ya dinyayê orf, edet û bawerî winda dibin, Ev rewş di lîstikên zarokan de jî dîyar e, ji ber ku zarok bi telefon, tablet û kompîturê ve dem derbas dikin, ev jî dibe sedema nelîstina lîstikan û jibîrkirina lîstikan.

Ji ber ku li gundê Qereqoyinê berê xebatên akademîk nehatiye kirin, ji vî alîyê de û ji alîyê devokê de ji bo xebatên nû cihêkî xwe yê girîng digire. Ji bo ku li ser hin xalan kûr bibin bi hin mijaran ve hatiye sînordarkirin û di naverokê de ev hatiye dîyarkirin. Me di vê xebata sahê de rêbaza hevdiîn, çavdêrî û rapirsînê kirin.

**Peyvên Sereke:** Qereqoyin, Gundê Qereqoyin, Sêwrek, Monografîya gund, Berhevkarî,

## ÖZET

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi  
Sivereke Bağlı Karakoyun Köyünde Folklor Unsurları Derlemesi

Argeş BİRGÜN

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

77: Sayfa

Bu çalışma Siverek Karakoyun köyü’nde folklor unsurları derlemesi üzerine yapılmıştır. Bu çalışma monografi çalışmalarının bir parçasıdır fakat tamamıyla bir monografi çalışması değildir. Ulaşım, vaktin kısıtlı olması gibi sorunlardan dolayı tamamıyla bir monografi çalışması olamamıştır.

Bu çalışmayı yapmamızın amacı, bu köyde daha önce bu tür çalışmaların olmamasından dolayı bir ihtiyaç haline gelmesiydi. Karakoyun köyü siyasi, ekonomi, ticari gibi konularda Siverekte etkili bir köydür. Bir yandan bu köyde 34-40 yıl önce dengbeçlik ve halk hikayeciliği gibi konularda etkili kimselerin varolması bizi bu çalışmaya yönlendirmiştir. Araştırma yaptığımızda o kimselerden önemli derecede bir şey kalmadığını gözlemledik ve artlarında kalanları kaydettik. Bir yandan da kapitalist sistemin gelenek, görenek ve inançların yok ettiğini gözlemledik, çocukların oyunlarında da bunu görebiliriz, çocukların telefon, tablet ve bilgisayardan oyunlar oynadıkları için sokak oyunları ya da diğer oyunların oynanmamasında ve unutulmasına yol açıyor.

Bu köyde daha önce akademik çalışmalar yapılmadığı için bu çalışmanın bölge ağız bakımından araştırmacılar için bir faydası olacağını umuyoruz. Bazı konulardan daha fazla verim almak için çalışmamızı bazı alanlarla sınırladık ve bu saha çalışmamızda, görüşme(mülakat), gözlem ve anket çalışmalarını yaptık.

**Anahtar sözcükler:** Karakoyun, Karakoyun Köyü, Siverek, Köy Monografisi, derleme.

## ABSTRACT

Non-Thesis Master's Project

Collection of Folklore Elements in Karakoyun Village of Siverek

Argeş BİRGÜN

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkey

Department of Kurdish Language and Culture

77: Page

This study was carried out on the collection of folklore elements in the village of Siverek Karakoyun. This work is part of monograph work, but not a complete monograph. Due to problems such as transportation and time constraints, it could not be a complete monograph study.

The purpose of this study was that it became a necessity because there were no such studies in this village before. Karakoyun village is an influential village in Siverek in matters such as politics, economy and trade. On the one hand, the existence of influential people on subjects such as dengbejism and folk tales in this village 34-40 years ago led us to this study. When we did our research, we observed that there was nothing significant left of those people, and then we recorded what was left. On the other hand, we have observed that the capitalist system destroys traditions, customs and beliefs, and we can see this in children's games, as children play games on their phones, tablets and computers, street games or other games are not played and forgotten.

Since no academic studies have been conducted in this village before, we hope that this study will be beneficial for researchers in terms of the dialect of the region. In order to get more efficiency from some subjects, we limited our study to some areas and in this field study, we conducted interviews, observations and surveys.

**Key words:** Karakoyun, Karakoyun Village, Siverek, Village Monography, compilation.

## PÊŞGOTIN

Di vê xebatê de em li ser şeş beşan sekinîn. Agahîyên derbarê gund, jiyana çandî ya gund, orf û edetên gund ên berê û niha, tibba gelêrî, listikên gelêrî û li ser edebîtaya gelêrî sekinîn. Ji ber ku li vî gundî xebatên sehayê nehatîye kirin, ji vî alîyî de hin kereste hat bidestxistin.

Xebatên sehayê yê li gundan ji hin alîyan ve girîng in. Gelek caran ji gundan çîrokbêj û dengbêj derdikevin, ji ber bêderfetîyan ew kes li gundê xwe dijîn û jîyana wan bi derdorê wan ve sînardar dimîne. Piştî ku wefat dikin ew berhemên wan jî bi wan re diçin, dema me xebata sehayê dikir ev tişt derdiket pêşberî me, digotin rihmetlîyê Şêxo-Huso-Salih dengbêj bûn di govendan de dema kilam digotin def disekinî û me bi dengê wan ve govend digirt an digot rihmetlîyê Silo-Îbo çîrokbêjên pir baş bû, wexta cêyran diçû heta sibê ji me re çîrok digot. Gotinên wisa derdiket pêşberî me, ji ber bêderfetîya qeydkirinê ji wan kesan tiştên mayî gelek kême, zarokên wan jibîr kirine û ew berhem jî bi kesên wefatkirî re çûye. Li gor derfetên me, me hin stran û çîrokên ji wan kesan mayî berhev kir ku armanca vê xebatê jî ev bû.

Di amadekirina vê projeyê de spasdarê wan kesan im ku ev xebat derket holê, di serî de Şêwirmedê xwe Doç. Dr. Necat Keskîn û ji niştecihên gundê Qereqoyinê Şêxmûs Bîrgun, Xecê(Hatîce) Bîrgun, Riho Kutlutekîn, Emo(Emîne) Delen, Mahmut Delen, Mahmut Tûm, Serhat Evren û kesên navborî.

**Argeş BİRGÜN**

**Mardin-2023**

## DESTPÊK

### Mijara Xebatê û Sînorên Wê

Folklor ew zanist e ku çanda maddî û manewî ya gelêrî li gor rêbazên xwe yê taybet lêdikole, berhev dike, disenifîne, tehlil dike û dinirxîne. Folklor ji du bêtayîyên îngilîzî pêk tê: "folk" gel û "lore" zanist an jî lêkolîn. Bi kurdî bêtayîya folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Di navbera folklor û edebiyatê de pêwendiyêke xurt heye. Lewra xebatên yê pêşî bi piranî li ser edebiyata gelêrî ne. Folklor û edebiyata gelêrî di nav heman çarçoveyê de û bi hev re tên nirxandin.<sup>1</sup> Li gor Celadet Bedirxan "folklor, zanîn an zanistiya xelkê ye" Di zaravayên kurdi de ji bo zanista folklorê bi kurmancî "zargotin" û "zanista gel", bi soranî "xelknasî" û bi zazakî "zanistiya şarî" tê gotin.<sup>2</sup>

Di vê çarçoveyê de me li Gundê Qereqoyinê hemanên folklorîk yê wekî; çîrok, kilam, lorik, lîstik, bawerîyên gelêrî, tibba gelêrî, dawet-zewac û cureyên din yê gelêrî berhev kirine di encama lêkolîn û lêgerîna qada gundê navborî. Bi vî rengî qewareyek hate berhevkirin û cihê xwe di xebatê de girt.

### Armanc û Girîngiya Xebatê

Li gor hevdiîtin û lêkolînên me, heta niha li gundê Qereqoyinê xebatên wisa nehatîye kirin, dibe ku çîrok an stran hatîye qeydkirin lê ev ne ji ber xebateke dîyarkirî ye, ev bi awayekî xwezayî, ji bo dem derbastkirinê an jî ji bo hin armancên navxweyî hatîye kirin. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin ku hin dayik ji bo zarokên xwe yê çûne awrûpa re hin kilaman dibêje, hin kes deng û dîmenên wan ji zarokên wan yê Awrûpa re şandine, em dibinin ku berhevkirinên wisa ne ji bo xebatên akademîk in. Ji bo girîngiya xebatê em dikarin bibêjin dema em diçin mala hin kesan dibêjin rihmetlîyê apê min Silo pir xweş çîrok digot heta sibê nediqediya, rihmetlîyê Şêxê Edê, pir xweş kilam digot sibê da heta êvarê digot û nediqediya, rihmetlîya Xeco hekîm bû

---

<sup>1</sup> Yıldırım, Kadri; Pertev, Ramazan; Aslan, Mustafa, **Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî**, Weş. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, 2013, r. 11-12.

<sup>2</sup> Bedirxan, Celadet. "Fehengok", **Hawar**, j. 30, Şam, 1941, r. 759.

û hwd. girîngîya vê xebatê nîşan dide ku her ku dem diçe bi mirina kesan ve çanda gel jî pê re diçe, niha kesên wek wan çîrokan, kilaman, hekîmtîyê dike kes nemaye û nayê bîra zarokên wan. Armanca vê xebatê berhevkirina parçeyekî hêmanên folklorî yên gund e.

### **Rê û Rêbazên Xebatê**

Berhevkin parçeyek ji xebatên Monografîyê ye. “Monografî ew cure xebat e ku cara yekem ji aliyê Le Play ve hatîye bikaranîn. Monografî, ew lêkolîn e ku bî awayekê bi rêk û pêk û girêdayî zanyariyên giştî li ser qadeke berhevkin û komkirina agahîyan e. Gelek cureyên monografîyê hene, her wekî monografîyên gund-bajar, sendîka û monografîyên dezgehên partî û xebatên taybet yên têkilhev tene kirin.<sup>3</sup> Alîyek xebatê girîng heye ew jî cihê xebatê ye, cihê xebatê berfireh e, mirov nikare li cihekî astengdar bike, Metîn Ekîncî jî cihê xebatê wisa rave dike. “Maneya têngînên qad-seha ya rast “ Cihê ku berhêman gel tê afirinadin û jîyandin e” ev qad berfireh e, carinan gund, bajar, tax(mehelle), navçe dikare bibe, armanca berhevkar bi rêya wêne, deng, û bi devkî wan berhevkin e<sup>4</sup>” girîngîya cihê xebatê jî wisa anîyê ziman “Meqseda çavdêriyê ya bingeîn ev e ku rasterast di nav civatê de cih girtin û bi jîyînê ve qeydkirin e.<sup>5</sup>

Di çarçoveya vê xebata me de em bi awayekê giştî li ser hin hêmanên folklorê gundê/meheleya Qereqoyînê sekinîn. Me rêbaza hevdiîn, çavdêrîkirin û lêpîrsînê kir. Di hevdiînê de me ji *Rêbera Hevdiînê ya berhevkirina hêmanên folklorê* sûd wergirt ku ji aliyê Keskin ve hatiye amadekirin.<sup>6</sup>

---

<sup>3</sup> Bilgiseven, Amiran Kurtkan, **Köy Sosyolojisi**, Weş: Filiz Kitapevi, İstanbul, 1994, r. 245.

<sup>4</sup> Ekinci, Metin, **Halk Bilgisi(Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri**, Weş: Geleneksel Yayıncılık, Çap V. Ankara, 2013. r. 26.

<sup>5</sup> Ekinci, Metin, **Halk Bilgisi(Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri**, Weş: Geleneksel Yayıncılık, Çap V. Ankara, 2013. r. 67.

<sup>6</sup> Keskin, Necat, Zêrka Zêra: **Cureyên Edebiyata Gelêrî ji Dêrdora Mêrdînê**. Weş. Avesta, Stenbol, 2019, r. 193-195

### **Pirsgirêkên Xebatê**

Ji ber ku kesek ji bo berhevkarîyê neçûne malên wan, dema min behsa xebatê û armanca xebatê dikir, hin kesan nexwestin derheqê mijarên wasa de biaxivin an dengên wan têkeve qeydê an jî jibîr kiribûn, Dema min pirsek dikir, tişta ku dizanîbûn nikarîbûn bianîyan ziman, hin kesan mijar di hişê xwe de mezin dikirin, an jî ji ber şert û mercên malê derfet nedidît behsa van mijaran bikiran û pirsên me bi kurtasî dianîn ziman.

## BEŞA YEKEM AGAHÎYÊN DERBARÊ GUND

### 1.1. Agahiyên Derbarê Gund û Navê Gund

Li gor hevpeyvînên me, gundê Qereqoyinê ji eşîra Millî(Millan) bera Hackî ne. Di avabûnê de malbat ji derve hatine li gund bi cih bûne, hin malbat ji ku hatine ne dîyar in, lê hin malbatên ji gund dibêjin koka me digihê Wêranşarê, li gundê Minûtê bi cih bûne paşê li gundê Qereqoyinê bi cih bûne. Gundî di navbera xwe de, xwe bi navên hin bavan ve dide naskirin, li Minûtê; “Şêxoyî û Bekoyî” hene. Li Qereqoyinê Jî “Faro, Naro, Çawûş” hene ev li gor Mahmût Tum ev brayên hev in. Di navbera zarokên van her sê bra û du brayan de zewac çêbûne, bi vî awayî gund şên bûne.

Navê gund bi kurdî Qereqoyin, di bilêvkirinê de Qereqonî jî derbas dibe. Navê gund bi tirkî ye û li gor malpera Nisanyan 1835an de ev nav derbas dibe û gund gundê Kurd-Sunîyan e.<sup>7</sup>

Li gor zanîn û bawerîya gundîyan ev nav ji ber pezên reş tê û li gor hin gundîyan jî navê gund ji dewleta Karakoyunê tê. Li derdorê gundê Qereqoyinê navên derdorê gund jî bi tirkî ne. Mînak, Sarıgül(Sarigol), Kargalı(Qerqelî), Çeltik(Çeltûg), Gözelek(Gozleg), Kayseri(Qeyseri), Kavalık(kavalix), Meleköy(Melewki), her wiha navên kurdî yên bûne tirkî jî hene Kilîsek(Ediz), Minût(Yücelen) Kanîreşk(Karasu) û hwd. armanca dayîna van navan ev e; Li gor Mahmût Delen(97) Di serdema Osmanîyan de ji bo kesên serkeftî an jî xizmet kirî re erd dihat dayîn û berê tapîya gundê Qereqoyinê jî li ser paşayekî bû.

Gundê Qereqoyinê 15 km ji Sêwrekê li ser rêya Rihayê ya kevin e. Li gor Wîkîpedîyê piştî guhertina zagona 2012an de ev gund bûye taxa(mehellleya) Sêwrekê, dîsa li gor wîkîpedîyê 2019an de hejmara mirovên li gund dijî 1.418 e<sup>8</sup>, lê belê ev li gor kesên me hevdîtin pê re kirîye ne rast e, ji ber ku gelek kes çûne derveyî

---

<sup>7</sup> <https://nisanyanmap.com/?yer=33158&haritasi=karakoyun> (03.01.2023)

<sup>8</sup> [https://tr.wikipedia.org/wiki/Karakoyun.\\_Siverek](https://tr.wikipedia.org/wiki/Karakoyun._Siverek) (03.01.2023)

welêt û li gund najîn, an jî îkametgaha wan li bajarên cuda ne, ev hejmar ne rast e, li gor kesên me hevdîtin pê re kirî bi texmîna wan wisa ye: hejmara kesên li gund dijîn 700-800 kes in, bi qasî 800-900 kes jî li derdorên Awrûpa dijîn û nêzî 300 kes jî li derveyî gund ango li bajarên wek Amed, Mêrsîn, Stenbol û li cihên din dijîn. Li gund derdorê 225-250 mal hene.<sup>9</sup> Hejmara malên bi ax 30-40 e, yê din jî bi piranî du qat in û katê destpêkê wek embar û axur bikar tînin. 30-40 mal jî ji aliyê kesên li Awrûpa dijîn ve wek havînge hatîye avakirin.

## 1.2. Nasnameya Etnîk a Gund

Li gor Mahmût Tum û hin gundîyan berê di gund de Ermenî hebûn. Sedema vê bawerîyê jî ev e. Li gund xirbeyek heye, dibêjin Pala Xirbe(hüyük), di wî xirbeyî de av heye, di zemanên berê de ji wî xirbeyî(ji cihê bilin ber bi jêr) şikeftê hebû. Ev şikeft di binê malan de di binê hewşan de hatibû çêkirin, lê belê gundîyan ev tişt nizanîbû, bi demê re hin kesan mal, hewş lêkirin, bi tesadufî rast lê hatinin, li gor Mahmût Delen dewletê ew kontrol kirîye tiştêk tê da nedîtiye. Gundîyan jî ji bo xanî û hewşên xwe ew şikeft xera kirin û girtin. Niha ji Ermenîyan an jî ji Bîzansîyan tiştêkî ispatkirî tune, Xirbe heye lê di derheqê wê de jî tiştêkî bi zanistî ber bi çav tune. Li gor bawerîya me berê jî Kurd hebûn ji ber ku Mahmût Tum behsa 7-8 kalikên xwe dikir û navên wan dijmart. Ev jî teqrîben rastî 350-400 salî diçe. Li gor gotinan hejmara malên berê heta 50 sal berê 30-40 mal hebûye. Mahmût Tum digot ku gelek mal ji derve hatine, ew bi xwe jî her tim pez xwedîkirine. Ev jî bawerîya etnîka berê yê li gund dijî dike Kurd xurtir dike. Ji aliyê din de jî di malpera nîsanyan de ev mijar hatîye zelalkirin. li gor malpera Nîsanyan 1835an de ev nav li gund hatîye kirin û ev gundê Kurd-Sunîyan e.<sup>10</sup>

---

<sup>9</sup><https://www.google.com/maps/place/Karakoyun,+63600+Siverek%2F%C5%9Eanl%C4%B1urfa/@37.6843152,39.2172663,1602m/data=!3m1!1e3!4m1!1m7!3m6!1s0x40758047b940eb6b:0x94975df9d638b939!2sSiverek,+63600+Siverek%2F%C5%9Eanl%C4%B1urfa!3b1!8m2!3d37.754104!4d39.317716!3m4!1s0x1534d15d399d8bcb:0xe119ab48cafd404!8m2!3d37.6882694!4d39.2182517?hl=tr-TR> (03.01.2023)

<sup>10</sup><https://nisanyanmap.com/?yer=33158&haritasi=karakoyun> (03.01.2023)

### **1.3. Aboriya Gund**

Berê karê ajalxwedîkirinê hebû bêtir jî pez bizin dihat xwedîkirin û cotkarî dikirin, cotkarî jî ce, genim, nîsk, kuncî, nok û hwd. yê bej yanê teneyên bê av. Ber wê re jî fistiq rez jî hebûn. Berê memûr û Awrûpa tunebû, çî dihat ji gund dihat. Perê ku ji gund dihat di gund de xelas dibû, zarokên malê gelek bûn, zewaca wan, xanî û malê wan têra xwe dikirin.

Niha sontaj hat lêxistin, av derket, pê re pembo, misir, îsot, frengî, balcan, ceh genim, kuncî, nok û nîsk, fistiq, rez û hwd. karên cotkarîyê dikin. lê belê karê ajalxwedîkirinê ber bi xelasbûyînê ye, kes nakevin wê zehmetîyê. Ji xeynî van, niha aboriya gund/gundîyan bi rewşa çûyîna Awrûpayê ve guherî. Di malê de 5-8 kur hebin ji xeynî 1-2 kesî hemû diçin Awrûpa, bêtir çûne welatên wek Almanya, Fransa û Belçîka, welatên wekî din jî çûne hene.

Bi çûyîna Awrûpa re dewlemendîya gund jî zêde bû, dema ji 6 birayan di mal de yek bimîne ew qezenca erdan ve li bajaran xanî, erse, dikan û hwd. karên bazirganîyê dikin.

## **BEŞA DUYEM JIYANA ÇANDÎ YA GUND**

Wateya peyva “çand”; orf, edet, tore, kultur û hwd. diçe. çand kevneşopîyek e, gel nasnameya xwe pê ava dike, dema gel behsa hebûna xwe dike xwe distpêre çanda xwe û nasnameya xwe bi wê şirove dike. Em dikarin bibêjin çand serenaveke giştî ye, di bin banê wî de hemû jîyana gel heye. Di vê mijarê de em ê li ser hin kevneşopîyên rojên taybet û bawerîyên li ser zîyaretan bisekinin.

### **2.1. Kevneşopîyên wek mihricanan(festîval)**

#### **2.1.1. Serê Salê**

Berê pîrozkirina serê salê hebû, dû esir zarokan, xortan debo digirtin li malan digerîyan ce, genim, nîsk berhev dikirin, digotin “serê salê binê malê xwedê kurkî bide vê malê” xwedyê malê tişt didayê a zarok diçûn ji dikanê tişt dikirîn û kêf dikirin. Niha eyb e kes narin ber qapîya. (M.E)

#### **2.1.2. Newroz**

Berê tunebû van dawîyan ket nav gund, Newroz li gor bawerîya gund sembola azadîyê ye. cihê strangotin, govendgirtin û cihê kêfxweşîyê ye. Zarokên salên wan 10-20 salî berîya 21ê Adarê hefteyek deh roj amadekarî dikin, ji nav gund tekeran didizin, tekerên li ser çalên kayê, axurê dewaran û hwd. hin malbat jî ji bo kêfxweşîya zarokan bi destê xwe tekeran didin zarokan, di gund de di nav xwe de zarok li gor derdora xwe koman çêdikin û her kes cuda cuda agir pê dixin an jî bi hev re pê dixin, dema tekeran didizin hin malbat li bera wan dide ji bo teker dîsa bigrin, ew jî ji bo wan cihê henekan e, dema yek lêdanê bixwe yê din pê dikenin, ev teker komkirin cihekî kêfxweşîyê ye, zarok tekeran di malên xerabûyî an jî li gor xwe li hin cihan vedişêrin, her kom herî kêf 30-200 teker kom dikin. Dema kom dibin yek ji 250 tekerî jî zêdetir kom dikin, ger cîran û gundî ji dûman aciz nebin ji pêxistina wan re aciz nabin, astengî nakin. Ciwanên mezin biçûk hemû kes tên li dor agir govendê digrin, sloganên polîtîk diavêjin, kesên bi hunerê re eleqedar hebe ji wan re saz, darbûkê, gîtar lê didin, ev

kêfxweşî çawa dinya tarî dibe destpêdike heta 12ê şevê didome. Ger ji qereqolê tehtît û astengî derkeve, kesên mezin tên agir vedimirînin, lê zarok diçin cihên din jî agir pê dixin, xwe ji ser re diavêjin, govendê digrin û heta derengîyê şevê li ber agir dimînin.

## 2.2. Zîyaret û Çîrok û Bawerîyên Girêdayî Zîyaretan ên li Gund

Dî çanda gelêrî ya mîletan de yek jî bawerîyên gelêrî bawerkirina li ser zîyaretan e. Li ser vê yekê di encama şert û mercan de yan jî pîştî qewimîna bûyerekê cîvak hîndek bîr û bawerîyan li ser van zîyaretan ava dîke. Li ser mîjare li Gundê Qereqoyînê jî li ser zîyaretan gelek bîr û bawerîyên cuda derketîne meydanê. Dî encama hevpeyvîn û lêkolîna me de, me bî awayekî gîştî fikir û raman û bawerîyên nîştəcihên vî gundî berhev kirin.

**Şemso:** şivan bû ji wê da hatibû (ji hêla Serhedê), waxta digê gund baran dibare û dibe firtine a dûrî va derna pezê wî jî di nav celbê-herîyê da dimîni, pezê wî gi mir û ew jî mir a bû sibe gundî çûni ser, pezê wî ji xwa girt, a mezelê wî li ser Pala Xirbe(hüyük) bû. Ga mi wan digo neşuştî tevî çarix û gora wî go mêrik kirin çahlê(kortik) û herî bera ser da, a digo ar ser vê diket a bû zîyaret, a dûra xelkê xanî lêkir mezel mezel nema mi meze nedî.

**Keçik:** Ji gundê Keserkoprîyê keçikek nexweş bûyi bavê ji bo bibê xesta bajêr(sêwrek), bavê, keçik li kerê kirîye anîye gihaye gundê me û keçik mir û li gundê me jê ra mezel çêkir. Me ji bo wî mezeli digo keçik. Dibê kî dûrî mala xwu bimri û qelbê wî temîz bi ew dibi zîyaret. Hîn ga mi qîz bû ew tişt çêbûyi. (berîya 80-100 sal). Mezelê wî hinda meytêbê bû, waxta em zarok bûn me li wir top dilîs û me dî gemar li ser mezel radibû, ga mi jî dogo wira mezel i. A dûra mekteb lêkirin û mezel gi xira kirin.

**Şêx Mûrat:** Li gundê Qerqelîyê((Kargalı) 2 km li roavayê Qereqoyînê ye)) yi. Dibê “tu çî miradî heri qebûl dibi. Merî sê carê dor mezelê wî doş dibi û deri binya nigê wan û ji xwu ra ban dikin, dua dikin. Em dibên ” Kalo me xwu li xwedê girtîyi me te girtîyi, a tu miradê me bîni cî a lawikê mi bizewicîni, ti îşê me doxrî ki, a vira mera diêşe tu rehet ki, em kevrê wî li xwu didin (kevir dorê heni, kevir bellî yi.) Em çîçek herya wî dînin, em şekra davên ser, em paça bi darê ve dikin, merî mirîşka dibi

ser û ser jê diki, birxur çêdiki û dîni em li cîrana bela dikin, em bi çi nêêtê deri dibê, ti qebûl ki. Herya wî teberik i. Em dîni malê dikin nav avê û em vedixun, merî avê diki qulpikê û sê cara dibê bisimîla û vedixwin.

Ê gi zara nîni, deri ser ji xwu ra ban dikê ûcaxê wan şên dibin, ên şîrê wan tunebin, dayik, deri şîr dikevê, încîya xwu merî bîni!

Îlim berê şêx bûyi, qey şextî kirîyi loma bûyi zîyaret, încîya mera bi çi weri waya yi. Çarşemî û îniyê merî narê, dibê Şêx Mûrat gotîyê çarşemî û îniyê mên. A rîyê di hûn kînga tê werin. Ga mi jî diçû berê da wa hatîyi.

Ev her sê zîyaret bêtir di nav kesên temen mezin de bibandor e, lê belê ev bawerî ji bo hemû kesan derbas nabe, jî kesên pê bawer nakin jî gelek in. Li gor pirsîyarî û çavderîyên me niha gelek xort çîroka van jî nizane û wek me behs kirîye li wan kesan şop nemaye, lê gora Şêx Mûrat hatîye parastin jinên gund niha jî diçin û duayan dikin. Li gor çavderîyên me dîsa me dît ku bawerîya Îslamê jî di nav ciwan-xort û zilaman gelek kême.

## **BEŞA SÊYEM**

### **ORF Û ADETÊN GUND ÊN BERÊ Û YÊN NIHA**

Urf û edet du peyvên erebî ne ketine zîmanê kurdî. Di ferhengê de wateya “hukim, kevneşopî, tîştta ku ne li gor şerîetê be, di nav civakê de xwedî zagon û hukîm. Her weha tê wateya tîştta ku hatî elimîn û hînbûyîn.” Urf û edet birêkûpêkkirina liv û tevgerên di nav kesayet û malbat û der û dor û cîran û cîvakê de ye û xwedî rê û rêbazên esasî ne ku gelek caran encama hinek kiryarên xelet ve şexs tê cizakirin.<sup>11</sup> Me ev mijar bi navê revandina jinê de wek mînak daye nîşandan.

#### **3.1. Jidayikbûn**

Di vê mijarê de em bêtir li ser zaroka sekinîn, li gor pirsîyarîyên me, me dît ku ev mijar fireh e û cihekî xwe yê taybet heye.

##### **Agahîyên li ser zarokan**

Di vê mijarê de qesta me navlêkirina zarokan, çel roj, bawerîyên pûç, navên nexweşîyên wan û lorik in.

#### **3.2. Navlêkirina Zarokan**

Ji bo navlêkirina zarokan hin cure hene: Bav – Dê navekî xweş dibîne êdî ew nav lê dibe.

Di malbatê de kesekî qedirgiran hebe ew çi çibêje ew dibe, ev kes ya yekî girtî, yekî nexweş, yekî kal, şêx û hwd ji malbatê yek xewnekî dibîne, dibêjin şêx, an yekî wefatkirî an jî kesekî din tê dibêje keçek-kurek ew ê ji bûka te – qîza te û hwd. ew ê çêbe wî navî lê bike. Hin carnan kesên xwend dîtî nizane jin hamîleye an na. Ji ber bawerîya xewnê ew nav lê dibe eger lê nebe ew zarok nexweş dikeve.

Ji malbatê her kes navekî dibêjin û kîjan xweş be di nav xwe de wê lêdikin.

---

<sup>11</sup> Örnek Sedat Veyis, **Türk Halk Bilim**, Weş: Kültür Bakanlığı Yayınları, Çapa II., Ankara, 2000, r.123-124.

Mal di nav xwe da li navan digere, her kes goreyî xwu navekî dibê pašê wan navan li kaxitan dinivîsînîn û yekî ji malê bi qûrayê ve çavê xwe digre û destê xwe li nav kaxian dixê û yekî digre êdî ew nav qebûl dibe, hinek jî sê caran qûrayê çêdike eynî nav du caran derkeve ew tê qebûlkin.

Di navlêkirinê de cihê xal û xaltîkan û mabata dayikê zêde tune, bêtir aliyê bavê nava lli zarokan dikin.

Piştî gi nav li zarokan bû bav sê caran di guhê zarok de navê wî dibêjin û duayan dikin “navê bi xêr, emrê dirêj û hwd.”

Li gundê dorê jî hinek digrin ban mele dikin di guhê rastê de mele bang dide di guhê çepê de jî bav sê caran di guhê zarok de navê wî-wê dibêjin.

### **Ji bo zarok û dayikê çel roj**

Êda bav kari zarokê bigri. Êda teba meba dorê deri. Çelê zarok derdikevi şûnda dayik dikari derkevi derve dikari heri her derê Çelîn (jina çel ro neqedandîyi) nikari heri cîkî. Gi deri mala kê mirîşkê kê qurp bi ew hêkana gişkî diherimîni xelk jî nahêli jina çelî weri mala wan.

Wexta bûkek ji malê derkevi gi jina çelîn heri wê dawetê dibê wa jina zara nîni. Gi jin zara neyîni, dibê weri pêşa(pêşmal) xwu têki hustîyê zarokê, bûk pêşa xwu dixi hustîyê zarokê û vedike û sê cara dibê “tu girtîyê mi bû, mi te berda” êdî ew bûka yê zara bîni. Wexta neri dawetekê gi çelîn heri mala bûka nuh jî gi ji bûkê re zaro çênebi dîsa ji bo wê deri mala zarokê. (ev bawerî niha jî heye, jin çel rojan dernakeve derve)

Wexta jinek çelîn be yek bê xebera malê, tiştê xwe têki binê serê jina çelîn êdî bi wê niyeta yê tişkek xistibe binê serê jina çelîn, jina çelîn xewna wana dibîni. Dibê xewnê jinên çelîn doxrî derdikevi. Tiştê diki bin yastiqa çelîn gore, gelem tiştên were yi. (ev niha jî heye) dibê xewnên çelîna gi doxrî yi.

Birinc, pelok(bulamaç), bastik(pestîl) û hêk diqeînîn û tiştên were dîni. (Niha jî ji bo dilxweşîyê an ji bo duayên çelîn xwarinê dînin) Gi yekî xwarin anî ferê(firaq) wan çel royî bi neşuştî li mala mera dimîni, çel ro çû şûnda fera tê şuştin û di bêjîngê de tê belavkin. (Niha jî ev bawerî ne zêde xurt be jî didome)Heta çelê zarok derdikeve

du- sê caran serê zarokê dikare were şuştin, wexta were şuştin jî şijûnekê an filtikenekê(devê filtikenê girtî yi) dikin bin legana zarokê.

Gi çel derkeve, dê jî zarok jî bi tasa çel a hec, çelê xwu derdixi a diqedî. Dibê serê zarok û dê keçik dişon. Keçikê heri avê sêrî ki, serê dê jî serê zarokê jî, hiken kes tenê serê zarokê dişon hinek jî serê wan bi hev ra dişon. Wext keçik avê serê dê û keçikê dikin bi deng dibçjin “çelê kûçka, çelê piska, çelê însên gi herin û dubare dikin û dibên a çelê we qedya” (Niha jî ev berdewam dike) Waxta bebek nuh bûyi, du rokî bi sê rokî bi, yek hamîle ba dihat ser digo giranya wê ketîyi ser bebekê bira va nê(neyê).

### **Bawerîyên li ser zarokên çelî**

Heta çel royî nan û şijûn ber serê wan da yi. (niha jî dewam diki. Şijûn ji bo cin û pîrebokan i.) Dahs, şûjin, didin ber serê bebekê, berê dayikê çi şiv bixwara şijûn dikirin nav, şijûn heta dawî nav da dima. Dibê Îsê jî bebeka wê bû go pîrebok xwu bera zik da, dûrî va derna zik nepixî û jinik can da. Mesela av vexwara şijûnek dikir nav bardax û vedixwar, dibê pîrebok ji hesin ditirsi. Gi jinik bimirîya gi tişteke bibûya digo pîrebok ketîyi zik.

### **Îskinî**

Wexta îskinî ji zarokan weri em dibên eyarê xwu fire – zikê xwu fire diki. Ji bo wî tişteki naki bi xwu disekini.

### **Vexwarina Avê**

Çel royî avê nadi zarok dibê gune yi.

### **Girêz ji dev tê**

Ava gi ji devê zarok tê re dibên girêz. Dibên zarokê gi girêz ji dêv were baqil e. Ji bo girêz zû biqede gerek xal bahnîya xwu di êş da bike (xal dere êş bahnîya xwu di arvan da dike û pahnîya xwu diki devê xwarzîyê girêza wî disekine. Ev carekê dibe)

### **Navika Zarokan**

Zarok dibi şunde 2-3 rîyan de navika wî dikevi. Li gundê Qereqoyinê navika keçikan davên malê, malê de vedişêrin(ji bo keçik ji malê nebin û serbest nebi), berê

dikir devê pêz (ji bo ji pêz hez biki) û ê lawka jî davên derve ya cîkî xweş, hinek navikên zarokên xwe davên dor mektebê Ji bo gi xwendevan bin. Di nav malbatê an derdorê de kesên baş ya jî pêşketî hebe digrin vê navêkê bi dû wî ra davêjin, meqsed bira zarok li ew kesê deri heri.

### **Ji Bo Diranan Dan Kelandin**

Wexta diranê zarokan çawa derdikeve, dan û nok tev dikelînin û li cîran û malbatan dan belav dike, ew kesên dor jî hedîyeyan dide zarokê. Sehan vala nayê vegerandin. Ji bo vê bawerîyê gotinek heye dibê vê zarê gotîyen “ma dayê te derdê dirana qe nedîtîye, ma dranê te qe naêşe te ji ma hinek genim ser da belkî hinkî zûka derketa” dibê zarê berê wa gotîye, ji bo êşa wa zarokan dibê ji xwedê da ziman ketîye dêv û gotina xwe gotîye. (Niha didome)

### **Kosteka Zarokan**

Zarokên êdî radibi ser niga û dimeşi jin di na xwu da kostek zarokê diqetînin. Ev jî zarokê li erdê dide rûnitsîn pêşa wî tije şekir û leblebî û hwd. dikin, nigê wî vedikin û benekî dikin ber pêçîyên wî ên qalind- pêçîya mezin, tenê ben dixê nav pêçîyan lê girênadin. Ji ên dorê jî yekê wî benî ji nav pêçîyên zarok derxînin û bibe bavê erqekê- celbê û weri. Wexta yek ben digri û direvi gerek yek jî bide dû ji bo wî pê bigri, bi zanetî malbat yekê gi nikaribe bigê wî ra dibê bera wî di. Gerek negê, gi bigê yê direvi û pê bigri, dibê ew ê kostek hatîye qetandin ew ê tim bikevi.

Li hinek cîyan jî gundê dorê, ji bo pêşa zarokan şekir, neynik, şe, qelem jî dixin pêşa zarok, sembola van jî xendin û xweşikbûnê rî didi.

### **Nexweşîyên Zarokan**

Bi derfetên pêşketî, di nexweşîyên zarokan de, dê-bav zarokên xwe dibin nexweşxaneyan, ev bawerî êdî nemaye, lê wek bawerî di hişê gundîyan de ev hene.

### **Ser û Binê Mehan**

Ser û binê meha dikevi, her meh vedirşin bîna genî ji devê wan tê, a dibi hinda pîreka a wa inya (+) wê dax dikin. Ev daxkirin jî bi tenîyê çêdibe û zarok rehet dibi.

Li gund jina Sînê Ebo a va Nûrê û ga(dayika) Remzan a wana îja tenî diki inya wan û ser dilê wan jî tenî diki. Taybetiya van jinan jî ev e. Divê ev jin brayên wan tunebe. Ê gi nanê bra nexwarîye, dax diki.

### **Kula Bin Erdê**

Tamareka şin ji bin sîngê heta bin navê xuya dibe, dibên zikê zarok diêşe. Pûng û danhûrka kufta di nav hev da dikelînin didin ser wî tamarî û ew tamar dûra diçe. Royê du car dide ser yek sibê heta êvarê, ya din êvarê heta sivê sê rîya didi ser zikê zarokê û girêdide, ew tamara şin deri û zarok rehet dibe.

### **Xwarin li Pitikê(bebek) dikevi (xwarin li ser dila dimîne)**

Li Kilîsekê(gundê nêzîkî Qereqoyinê), pîrekek dike. sê arê cixarê li dilê zarokan ve didin, berka guhê wan diki, li piştê hêla jor didin, li nigê wî hêla hundir bin gûzekê didin, sê deqan li ser ve dikin a zarok bi emel dikevin û rehet dibin. Ev nexweşî bi demê ve bi kesan ve bi rêya “Destdayînê” berdewan dike. Wexta xwarin li zarokê dikeve gerek dê goşt, hêk nexwe.

### **Destdayîn**

Destdayîn ji bav û kalan de dimîne kî kal dibe destê xwu didi yekî can îka li wî canî tê. Destê xwu didi destê can û sê caran dibê “destê mi destê te, mi va çi tedawîyan kirîye û çi hekîmî be îja tu hekîm be.”

### **Girîna Zarokan**

Berê wexta digirîyan û malê seba wê nizanibûya piştî zarokê li nav du milên wî (qorincê wî) hinekî xwîn dikirin û he kes vê nikani biki, ev jî bi destdayînê ve dewam dike.

### **Xuş(r)ûng**

Wexta zarok ji dayik dibe heta çel royî gerek zarok destê xwu bi zarokê neke û çekên wan tev neyê şuştin û bav nikare çekê(cil) zarokê jî têke destê xwe û çekê bav jî li zarok nabe. Wer neke ser çavê zarokê dibe pizirik berê wa bû. Niha kêmbê jî hin bawerî dewam dike. Çekê wan bi hev re nayê şuştin lê bav zarokê dike destê xwu.

### **Kul - Kunêr**

Sabûn û şîrê dê bide ser kula jî rehet dibi, (niha êdî diçin nexweşxaneyê lê kêr be jî didome) Nav hev da dikelîni û lê diki.

### **Çavê yekî/ê de Bûk derkeve**

Sîr pê didin. Por pê didin. Porê dotmama bi pismam ra zewicîyi.

### **Destê cî heri**

Destê mera cî (ji hev) heri dotmam û pismam pê lê diki, pismam û dotmam nîşanlî bi pê lê dikin rehet dibi.

### **Lorik**

Lorî ji bo zarokan razînin, wan aram bikin piranî ji alîyê dayikan ve bi melodîyekê ve tê gotin.<sup>12</sup> Li gor hevdiştinên me, beşa korikan de qelsîyek hebû. Yê ku me bi dest xist ev bûn.

### ***Lorê lorê***

Bêşîka lorê mi darê çamê

Go ez ê bişînim ser hosta û necarî Şamê

Lorika mi ne azep bi

Law ez ê rast kim ser dotmamê.

Bêşîka lorika mi darî ter i.

Law ez ê bişînim ser hosta û necarî ker i

Dayika wê ne hazir bi

Bira bêşîga lorika mi ji xwu ra bi xwu bigeri.

---

<sup>12</sup> Keskin, Necat, Folklor û Edebîyata Gelêrî, Weş. Avesta, Stenbol, 2019, 275

Ê digo lorikê qurba dilorînim

Giş ji te ra

Law nîvê pir jî dilorînim

Ji heyran û ji hewesê dilê xwu ra (S.O)

.....

Go bêşîga berxika mi qebeyo

Go mi avît sero sor gebe yi

Go tê çîçkî rakevi

Dayka te gune yi. (E. D)

### **3.3. Zewac – Daweta Berê**

Dawetên berê Kesî kes nedidî, digo bavo digo ki her qîza filanê bixwazim, tew lêwik nedîyi dixwest, lawik digo bav û dêyê mi gotîyi tamam, çê dibi xirab dibi. Dê û bav goreyî xwu yek didît û diçû dixwestin. Berê bav diçû dixwast, digo em dawa mervatîyê dikin. “Em hatîni mervatîya we dixwazin, em dixwazin keçka we bixwazin.”

Ne lêwik keçkê dîyi ne keçkê lawik dîyi, waxta derin dixwazin jî lêwik bi xu ra nedibirin, rîya hinê û dawetê jî lêwik keçik nedidî. Diha rîya gi dianî malê didî. Berê soz tunebû, peya çay vedixwarin û fatîha xwu dixwarin û diçû. Waxta datlî(nîşan-Şîranî) jî piskiwît û lokim bela dikirin. Ê gi dûrima wan tunebû tişteke bela nedikirin. Waxta me da jî me nikanîbû bigota na ya erê gi dihat hesêb me didan, nedihat jî nedidan.

Berê gelînlix tunebû, Axe Banî(rengê kefiyê zer e) û Ebe hebû, Ebê wa sor heni hîn niha li pîrekê rihayê heni. Digo “bi vîya ji hundir derketîyi, digo ew ê diha bibi kefen jî ji mala xwu derkevi, qedya.” Soz girtîyi şûnda, hinik piskiwît û loqimê xwu dianîn û ban çar meryê xwu dikirin, aîla xwu dikirin, mîna niha urbîyan çenedibû. Ban

meryê xwu, cîranê xwu dikirin û loqim û piskuwîtê xwu bela dikirin a fatîha xwu ya dawî a mezin dixwarin û diçûn.

Qelen berê hebû ê mi 35 hezar bû, bi 35 hezaran kerîk pez dihat kirîn. Îja wê çaxê nivê zêra li ser mala bavê bû. Berê 8 zeynet û Dobrak bû. Wa 4 zeynet û niv dobre li ser mala zêvê bû, nivê di jî li ser mala bavê bûkê bû. Rihala bûkê jî butun mala bûkê dikir. Yanî mala zêve tiştik nedikir. Mala bavê bûkê jî gişkî bi vî gelenî ve jê ra cihêz dikir. Wê çaxê xilata apê û a xalê jî hebû. Vê dawyê a apê rabû ma a xalê, a niha a xalê jî rabûyi. Waxta me da xilatê dê û bira mi ra tişteke tunebû. Gustîla birê a dê ne a filan, topek(kiras-kûmaş) ji pîrekê û dê ra dikir waya bû. Niha gustîla brê heyi a dê jî heyi(hinek dikiri hinek nakiri). Dawet rîya çarşemîyê destpêdiki pêncşemîyê hine, îniyê jî derdiket.

### **Amadekarîyên Roja Dawetê**

Peya rîya hinê, yanê rokî berê dawetê, mîkê(mîyekê) ser jê diki, gişî hûr diki hazir diki, gişkî dikelîni berê ban aşxaneçîyan nedikir, di nav gund da kesê jê fam biki hebi ew nê çêdiki. Ya jî ban esnafa dikir, berê hazir tunebû, niha ji her tişt ji bajêr hazir tê. Berê êvarê de fasûlyê xwu diki nav avê, êda sibe da zûka da hîn dinya tarî yi tê, a goştê xwu û ava şamika(firingî) sor diki û wî fasûlyê xwu bera nav didi û a dibi tirşa fasûlye û a sê teyşt çar teyşt birinc jî diki û a ew gunda gi tê dixwi. Berê tebox gi ji na mala dianî, ji bo bellî bi jî kevçî û sehan gi boyax dikirin. Îja her gi pêş da çû xelkê set set tiştê xwu kirî. Waxta xwarinê da pîrek peya wa gunda gi nê dixwi, pêşyê peya nan dixwi dûra jinik dixwi, gi fera qîm neki jinik rûdinin fera dişon û bi wa ferana nê didin jinikan, waxta nan qedya jinik wan ferayana gişî dişon. A dûra derin bûkê dînin malê, berê waxta bûk dikevi malê xwesî hesk û mastêrkê li hev dixi û dilîrîni, îlim ew ê wê mastêrkê û wî kevçîyê dar bişkîni gi neşkê jî li erdê dixi dişkîni.

### **3.4. Zewac – Daweta Niha**

Hezkirina keçik û lêwik hebi, gi a dê û bavê jî hebi, deri ji xwu ra dixwazin, gi yek were keçikê bixwazi, mala keçikê digri li hesabê xwu dineri, hinek jî deri ji meryê xwu dişewiri dibê filan kes keçika me dixwazi hûn dibên çi?

Niha wexta qîz tê xwastin li ser qelen, gustîla birê gustîla dê heyi, xilata xalê heyi, xilata apê heyi, ji bo metê û hatê(xaltîyê) top(kinc) heyi. Ap û xal jî wexta bûk ji malê derdikevi ji bûkê ra taqîyekê dîni, yanê pere wê naxwi. Boy gi zêrê bûkê pir bi tê xwastin, digo gi em negri hûn nakin(zêr nakirin).

Berê zêr û gustîl û guhar hebû, berê ben tije zêrê gazî dikir û li enîyê girê didan. Zêr ji inîyê hat jêr bû fena qolyê, dûra bû kember û marona setî û axitme û seata zêr û goreyî zengînîya malê zêr zêde bû, êdî kê çî kir.

Zave waxta gi dizewici, jina birê mezin, xweya(xweşka) ra, xweya bûkê a mezin ra ya jî a di malê de(edet guhar i), birê bûkê, ga bûkê ra gustîlkê dikiri. Hinek waxta qelen da goreyî lîsta yazîkirîyi, hinek jî goreyî dûrimê yi. Îja waxta di qelenda bi, rîyê eyda dîbi gustîlkê diki desta. Bê eyda tişkî nadê.

Niha zêrên mecbûrî; gustîl, bazin, zincîra hustû ye û niha jî kî her kes hezkirina xwu yi. Hinek ji bo kêfa xwu kember jî kari bikiri. (kember 450-500 milyar e (2023))

### **Nîşan**

Mesrefa malê, mala bûkê diki, hêla zavê jî peqlewe dîni. Mesela gi ji bo hinê dugin salonî bigrin mesrefa salonê hêla bûkê didin.

Maqyaj û çek û çolê bûkê gişî jî hêla zavê didi.

### **Hine**

Dibê kîjan mêra ji jina xwu hezdiki bira ew jinka hinê bistirê û waxta dawtê da deri ser xêrî şekra jî direşîni. Însanê nezewicî, hatîye berdan, bê zaro bi yanê ê udrê(qusûr) wê hebi hinê nastirê.

Rîya hinê Rivîkî(zêrê biçûk) dikin destê bûkê û dorê ra doştîbin û kilaman dibê, waxta hinê jî dikin kilaman dibên.

Rîya hinê, ji mala zêve yek, qedix û sehan û kevçî tişteki ji mala bûkê dîni, gi zara wan bi ser û binê meha dikevi, bi wê sehanê û kevçîyî ve nê didê zaro rehet dîbi. Edet i gere tişteki rîya hinê ji mala bûkê bîni. Berê, rîya hinê zave nediçû mala bûkê, niha êdî zava deri mala bûkê.

### **Amadekarîyên Roja Dawetê:**

Hîn bûk nehatîyi malê berîya xwarinê(xwarin ji Sêwregê tê) xoce mewlûtê dixwîni li ber mewlûtê di torbekî da du piskuwît, du şeker û lokimek heyî û di sehanekê da aşlixê(birxur, şorbe, genim...) malê û sulhîyek şerbeta çêkirî heyî merî paçekî sor davê ser wana û xoce li ser dixûni, wê şebetê bera nav şerbeta pir didi û mewlûtê bela dikin dûra jî her kes nê dixwin. Nan xwarin şûnda derin bûkê dînin mala zêve, berê li ser hespê bû niha erebe yi. Waxta gi bûk dikevi hewşa mala zêve, jina gi mêrê wê jê hez diki derdikevi ser sivrîngê û wî aşlixê li ser xwandîyê şeker û hinek perê hûr diki nav û li ser bûkê û mêvana tê reşandin.

Niha bûkê heri ber qêpî bisekîni, berê hêka xwu dişkîni, şûşa xwu dişkîni dûra hinara xwu dişkîni û yek jî quranê ser ra digri a dikevi hundir a dibi bûk.

### **Edetên Dawetê**

Niha, Damat boxçasî, Taqim elbîse ser mala bûkê yi. Qondera û çek û çolê zêve mala bûkê dikirin. Gustîla zavê jî mala bûkê dikin. Dema malbat zave tèn mala bûkê (ji bo nîşan, dawet û cihîzan) xweha bûkê pere ji malbata zave digirt, niha jî ev edet berdewam dike.

Wexta zava li mala şoşmên i. Hevalê wî ya gustîlê, tizbîyê, sol bi, tişekî zava digri dibi cem bûkê bûkê hedyê digri. Berê ya îşlik ya cotek gore ba digirt û diçû. Niha jî sol be tişteke be digre.

Berê mala bavê bûkê tev nediçû dawetê digo eyb i. Niha dugun salonî jî derket şûnda êdî her kes çû.

Rîya paşînyê(şemî) hine bazar jî dawet i. Edet dawet rîya bazarê başle diki. Qedhîn rîya înyê dernaxin(nayînin mala zêve) hinek rîya înyê başle dikin, def û zirna dianîn, bazarê derdixin. Bûkê rîya bazarê û rîya êvara înya(pêncşem) derdixin. Pirê wî rîya bazarê derdixin. Niha digun salonî yi, kînga bixwazi dawetê çêdikin.

### **Cihîzên Bûkê**

Du qat nivîn i (ji bav û kala da heyî) û fer û fot i, a niha soba dîkin, farfarkê dîkirin û goreyî qelen dîkin. Xwedyê bûkê goreyî hezkirina xwu li cem xwu tiştan dîkirin.

Çaxa bûk tê malê ji xwesîya xwu ra, gorima xwu ra, caya xwu ra, a pîrik hebi diki, hedîya tî ya(îşlig), ji bo xwezûr jî îşligekî dînin.

### **Berîya Zewacê, Stranên Dila**

Ev stran li ser dila hatine gotin, keçik dema diçûn qirşan di rê de ev digotin. Stranên ji radyoyê û ji telewîzyonê hatibe guhdarkirîkirin jî dihat gotin.

.....

Keçka gewr û li hawa

Zêrê zero li dawa

Wele ez Hebûna xwu niha nadim

Bi heft lawa (E.D)

.....

Berîka me berîka berê

Bira lê şin nehata yek tayê tûnê gewrigê bêxwedya vê xerdelê

E qurbana xelkê delalî bejna zirav

Bira îşev nîvê şeva ra biba nîvanê qulpa bêxwedî jî. (E.D)

.....

Bira dilî ji dil ba

Doşega bin mi û te herya şil ba

Bira balîva serê me kevirê îşk ba

Orxana min û te ser bayê kur ba

Bira dilî dilî ji dil ba. (X.B).

.....

Hawa hat û hawa çû

Sîyar hat û peya çû,

Çavê mi li çavê reş ket

Aqil sewda pê ra çû. (X.B)

**Kilamên di hineyê de**

.....

Ewra teqireqi

Nalê hespa me dileqi

Bira dostê me şa bi

Dijminê me biteqi. (Edo. D)

.....

Hewşa mala bavêê,

gi bi naht(kevîrê pahn) iii.

Kulava tê da raxiii,

êde bûkê xwu zûka bitewizîneee,

ber bûk hati. (X. B)

.....

Hinë bistirê di teyştê ki,

Kevçî kevçî avê lê ki.

Berê berê destê xwa zêve ki. (X.B)

.....

Xecê bûk rûniştîî ser sepetê

Biskê soraaa li rû ketê

Êde hevalê wele îş ne xeml û xêz e

Îş îzehan û mahrîfet i. Tîlîlîlîlî (R.K)

.....

Çîta heya ji çîta

Sîyar sekinî sekmana da cirîta

Bûka me qîza mêra

xwarzîya egîta tîlîlîlî (R.K)

.....

Zava gi zava ni

Textê zava zîv kutan i

Ya birê mii

Serka xorta gişka ni. (R.K)

.....

Masîko pelbiçîno

Avê jor da meşêlîno

Bûk bîlmezo metirsîno. Tîlîlî (R.K)

.....

Vêhla mala me bi kuncî

Wêhla mala me bi kuncî

Jê fîrya cotê kewê narincî

Birê mi serê çavê xwu dî

Eşqa dilêê xwu zewicî. (R.K)

.....

Hespa boz xemiland

Zêrê zer inyê ediland

Bê hevala mi kal i

Gewr i ro bertiland i (Emo D.)

.....

Giha heft guhera

Mi çinî û te kir cuhera

Bûk û zava çaxa hev ra (Emo. D)

.....

Arîye heft humama

Li serê donzde pismama

Pismama pî danîyi ber dotmama (Emo.D)

.....

Xanyê bavê te yî dêr i

îşev lê rakeevi têr i

sibe da heri û orix xêr i

xanyê bavê te yî nuh lê kirî

qulik û pace tê da vekirî

xeberdana xeber da mi

go îşligê zêve boxça bûkê diza birî. (Emo.D)

.....

Go xanîyê bavê te yî tac i

alîk ben o yekî zac i

talîka qîz û xorta

ya mirin i û ya zewac i. (Emo.D)

Hevala xwu bi heval kim

Temeyîka wê li bavê kal kim

Bira heri nav heval û hogira

Bira weri nav û xwêka xwu lê helal kim. (S.O)

### **Wexta bûk ji mal derdikeve**

.....

Xerîbî ne tu çek i

Tî yê pê xwu tê ra neki

Xelk ji mera ra ne dibi bira/bav

û ne dibi kek i. (R.K)

.....

Mi go bûkê meri avê

Nîka zêra medi tavê

Qîztî xweş i

Li mala bavê (Emo D.)

....

Bûkê bi rostê xi

Xêlya bûkê bi ber bê xi

Arkî bi kezeba dê û bavê xi. (Emo.D)

.....

Vî bayî guriguri

Xelya bûkê piripiri

Xema jixwu meki

Tu diki têkevi malka zengîn pere pir i. (Emo.D)

.....

Em hatino hûn deng meko

Hespa girêdi û tenga veko

Digo hûnê nîro pê ve

Li tîyê bûkê temaşe ko. (Emo.D)

### **Serê hespê girtin**

.....

Hevalê, serê hespa te serdîn i

Sêrî ji hevala mi distîni

Ti xeman mexwi

Wele tîkê te serê hespa te girtîyo te dikşîni. (S.D)

### **Bûk tê mala zêve**

.....

Bûkê gemarê davê

Tîyê te li te maşe kir

Tew xema mexwi

Tîyê te yê pera milyarê destê te ki. (R.K)

.....

Dawet kişya ber hewşê yi

Şingîn ket û qeydê yi

Kekê bûkê wele kilît girt û çû çolê yi

Heqê Qepî/ Sandiq(cihîz) (Emo. D)

.....

Mi go bê heval hevala vê hiyatê

Şahra reş ketîyi mazatê

Xal sekinîyi,

Xwarzê ji me dixwazi xilatê. (Emo D.)

### **Kilamên di govendan de**

.....

Leylo mi govendê nas kir

Temezî li inyê rast kir

Mi were leylo bireevînim lo

Ez ê bibim xelas kim.

(Mi revand bir xelas kir) (Şêxê Edê)

.....

Hewşa malê dengiz i

Qurşûna viziviz i

E dikim leylo bikujim lo

Booy du tilî quz i. (Şêxê Edê)

.....

Kevrê hewşê mermer i.

Çend zerya xwu da ber i

Awir tê fîstan zer i

Fîstan zer vir da weri

Şevka çûnî Adê da

şevka berê di adê da

Guçkê orxanê kaşkir lê

Mast bin qeymaxê xwu da (Şêxê Edê)

.....

Erdo şewitîyo hulmiştî

Keserik lê raniştî

Xwezî dilê govendê

Xwelî li jinê rûniştî. (Husê Hemcên)

.....

Buharî ewrî şên i

Mîr koçera dizên i

Gewr dibên em gewr in

Esmer tahmê dinê ni. (Husê Hemcên)

### **Revadina jinê**

Însan heyî dawê çêdiki, ya ayîlak xwu şûnê da didi, pere didi, qelenkî pir didi, hinik dawê çênaki, hinik jê digri yanê çeşît çeşît heyî. Qîza me çû û ket û mir me sîl kirîyi diha rîyê wê nabîni heram i. Gi dawê çêbibi jinik diha kani weri malê. Dibê berê digo, namûs avêtîyi ber kûçka, kûçka ranekirîyi ser ra derbas bûyi, wer ne qolay i. Ê xwedê çêbiki zor i.

### **Ger jin û mêr cihê bin**

Waxta mêr terka jinê biki zêr ji bûkê ra dimîni, a bûk terka mêrik biki zêr ji mêrik ra dimîni. Diha malê wan ser hev da nari.

### 3.4. Mirin – Şîn

Şînê berê, Xwedê nedi, qala şînê berê neki, îro mi digo pismamê mi mirîyi, min ê reş girêda û ez ê biçûyama şînê minê bikira haho haho, ê niha birê te bimirî tu nikani reşê girê bidi, êda heftak deh ro biçûya, malekê çêfî jê ra dianî, wa reşa dadanî wa çefya dida sêrî, berê şahrê reş hebû axê banî şûnê da dadanî sêrî. Gulyê xwu jêdikirin, qey wa bû, şîna niha ez ê xwu bişom veşom werim vira rûnim.

#### *Rihmetlî Îydê digo:*

Qereqonî bi kirkor i

Va cotalya doridor i

Go wele Ahmed kuştino

Bi rêbero bi destê zor i. (E.D)

Ahmed ji gund i, jinê direvîni dîni Qereqonîyê, tê davê paş gundîya, dîni davê xanîkê, jina bi mahr i, cem mêrê xwu pê vî ketîyi, a vana çito diki, hinek mêrik dîni, dibê ê gi jina te revandîyi a va yi di vir da yi. A mêrik didi û dikuji diki jinêkê jî bikuji, dest diki çefya jinikê, jinik ser xwu ra dişeqitîni û şev i derdikevi direvi û diha wenda dibi. Dûra çi dibi em nizanin.

## **BEŞA ÇAREM TIBBA GELÊRÎ**

Demên berê de, ji ber rewşa aborî û çandî çûnûhatina li nexweşxaneyan û peydakirina bijîşkan zehmet bû, di gel vê bi awayekî xwezayî û lihevhatî ev qad derketîye pêş. Her çi qas derfetên çûyîna nexweşxaneyan pêşetibe jî gelek navên behskirî hê bi awayekî aktîf berdewam dike, di hin nexweşîyan de qasî ku bawerîya gundîyan bi tibba gelêrî heye ji nexweşxaneyan tune.

### **4.1. Tibba Gelêrî li Gund, Nexweşîyên Tê Zanîn û Navên Wan ên Herêmî**

#### **Mirûstan**

Ji pîsîyê, ji qilêrê çêdibe. Dest û nig û zik çêdibi sêrî çênabi, mîna mohrekê, mîna perakî totoklî yi, hundirê wî gi pizirikê sora tê, dixuri, a merî deri pîrek jî dibiri peya jî dibiri du çarşemîya û înkê ser dixûni, peya bi qelem dibiri, pîrek bi cê dibiri, li ser Qirwella (Kul huwellahu) dixwûni, a wî ceyî tê didi, deh heb ce digri û dorê ra doş diki. A wa ceyana jî merî diki nav avê û tê, nav ava genî. Gi nexwûni mirûstan tim zêde dibi. Pîrekê bixwûni gi rehet nebû îja deri hinda peyê, peyê dixwûni. Niha derin xestê. Xestê jî rehet nebi deri ser dixwûni, dermanê wî birîn i, tixtor jî vîya nizani.

#### **Hefcark**

Bihukê pîs mîs yi, dikevi nav çekê mera, li canê mera digeri. Heft cara bi mera digri. Dixuri û sor dibi.

#### **Zerik - Tirsbirîn**

Peya bitirsi zer dibin, peya bi pîrek bi kî bitirsi deri cem Helîm, îja wa ya jinik çêdiki. Şeb (mîna leymûn dîzî yi, gewr i), zerka hêkê, arvan, di nav hev da distirê diki mîna heba yi, hûr hûr çêdiki çel tene yi. Diki sehanê êvarê derdixi derve, dibê histêrk xwu digînyêyi. A li ber histêrkê êvarê dimîni dibi sibe da tu dîni a her sibe sibe hebekê

dixwi, a xagî davê devê xwu. A însan wîya rehet dibi gi nebi îja deri dibiri. Paş hustûyê wan dibiri, inya wan dibiri, a va nigê wan dibiri (li paş guzekê), cilêt diki û sîr tê didi, ew jî du çarşemî û înik i, Helîm heba çêdiki, nabiri. Deri bajêr dibiri.

### **Navrakirin**

Nav(hûr-zik) dikevi deri kaş diki xurînî, a vîya(her du alfyê zik) kaş diki, kaş diki wî zikê xwu, zikê çûk, a dibê nava mera doxrî dibi. Nava mera bikevi çavê mera wer li erdê yi, cunyê(çog) mera wer şikîyayîyi, merî nan û av da dikevi, wer merî sist i, hekîm li bajêr heyi.

### **Îlancix**

Sancî dikivi pîyê mera, bêhem merî diziviri, gi çaxa merî bêhem biziviri, tamarê mera dihat ser hev, a wa dibi îlancix, bi sancî yi, merî deri hinda Eyšê, Eyšê destê xwu didi ser, didi seeer a wîya bela diki, miz didi a rehet dibi. Îlancix mîna noka derdikevi a wîya diteqîni, gi bela diki çito diki destê xwu didi ser, destê wê tilsim i, her kes nikani. Carê kirini destê wan lê hatîyi êda bûyi hekîm. Eyšê û Helîm bi xwu elimîyi.

### **Pîlketin**

Pîlê(mil) mera diêşi, merî dikani destê xwu raki, diêşi. A pîrek ya jî peya digri radiki rehet dibi.

### **Boçikketin**

Ga Şîrif Zeyno radiki, destê xwu diki bin boçkê û radiki.

### **Birîna dest-nig**

Berê desta mera birîn bûya, kayiş vedirov vedirov û pûrtika wî digri û didi ser birînê û rehet dibi. Napêçi hima diki devê birîna wî bixwu rehet dibi.

### **Şewata dest-nig**

Îja bişewiti, mûm, şima (kalkê nav hungiv), hêk, zeytîn yaxî, va tiştana nav hev du-sisê saeta dikelîni dikelîni dikelîni, bîrabîr i. Dibi melhema kurmancîyê, eyn edetî zer dibi. rihmetlîya Edê çêdikir.

### **Şikandina dest-nig**

Dikin cî, hêka xwu tev qalikê didi ser û dora wî gişkî çûya dêdîni, çar çûya dêdîni û bi bez girê didi, hêka xag tev qalkê wî dişkîni nav hev da hûr diki, didi ser wî cîyê şikîyayî.

### **Werimandina dest-nig**

Dest, nig, nav pîyê zara, gi biêşi merî hevîr û dims nav hevda distrê û didi ser boy wermê, boy newerimi, hewîrê kuftelix/arvan, werma wî dihat xwar.

### **Mîx niga ra heri**

Tişkî germ diki pê ve dêdîni, kevir mevir germ diki, hesnê pîs i ya mîx zeng i.

### **Qepsiketina zarokan**

Kirbît dikir tabûta wî, serê kirbîtê, heşa dikir qula wan der dibû. Sabûn dikir.

### **Jehrî ketin.**

Gi tişkî pîs bixwi, ziherlemîş bi, ya mast ya dew didê, dibê rehet dibi. Şîr nadê.

### **Kunêr**

Kunêr şin dihat di destê mera da, mera pîvaz dida ser ew kunêra derdiket, ew nê mêmâ gi derdiket, fena pizirika mezin i.

### **Serşikandin**

Berê tantiroto lê dikiri, erîya wî, sîravka xwê(xwê û av), ya ava şamka(salça) tê didan, şor i ya, bi birîna wî dida digo bira bikewi.

### **Sorbûna çavan**

Gemar dikevê merî şîrê dîya berdidê, gi sor dibi merî çayê jî bera çava didi. Qiçî, picarîk i li erdê şin tê, hima li erdê pahn dibi, dirêj nabi, a wîya dikelîni ava wî berdidê, gi çav mav sor bibi, çavê birîn bi, ava wî dikê.

### **Nexweşîya gurçikan**

Ew ji bo gurçika yi, baxirsaqê wan naşixuli, Ew Qurîncok i navê wî dikeland û ava wî vedixwarin.

### **Nexweşîya mîde**

Gerzezok(isirgan otu), hinik dikelîni ava wî vedixwi, hinik jî hima didi ser cunûyê xwu, dibi peqlîk û dişewitî a dûra bi xwu vedimirî. Wer dixwiri wer dixwiri, hinek pê rind dibi hinek jî lê nayê.

### **Qansêr- Nefes darlixî**

Pelê Hîro dikelîni û dixwi.

### **Zerik**

Waxta gi e zerikê bûm, xelkê digo ew ê Petîşok i, totolî yi, dendik tê da tiji yi, merî destê xwu didê hima bixwu diteqî. A wê çaxê gişk go ber bîvla xwu di û kaşki, go çi zerika te heyî gişkê weri, îja yekî nişka ve tê d teqandibû, avîtibû li beyn xistibû, go jinik mir. A îja Mahmûdê Hemê Xêlit go nebi nebi tu wîya qûlanmîşki, go tê nizanibi, go qedhîn(qattîyen) tu naki, wa zihêra wer pir i go, îja hinik diki, qey li yekî hatîyi. A digo gotîyi yanê boy zerikê wa dida ber bîvla xwu, go digo çip çip çip çip çip ava zer tê tê tê tê, ji îni minyê pa dibi. Gundyê me jî berê kiribûn.

### **Xûnbûna poz**

Gi pozê mera xûn dibi, xûn dibi, merî qalkê hêkê, merî diqelîni diqelîni dişewitîni di temezyê ra derbas diki, a wa hûrê wî merî diki bîvla xwu, rehet dibi qaynax dibi. Me ji bo Welat jî kir, a niha tixtor derketini kî guh didi vana.

### **Pahbelûk (Siğil)**

Ji pizirika hîn mezin i, fena topa yi av tê d heyî dibê ji pîsîyê çêdibi, gi beq çûbi ser jê çêdibi. Merî wê biteqîni bela dibi pir dibi, ji bo rehet bibi ji şîrê dara hêjîrê pê didi û hinek xwe digri dibi davê ava genî û gere kes te nebîni. A dûra rehet dibi.

## BEŞA PÊNCEM

### LÎSTIKÊN GELÊRÎ

#### 5.1. Lîstik (Zarok/Mezin)

Lîstikên zarokan yek jê herî girîngtirîn aktîvîte ye, ji bo perwedehî û pêdiviyên zarokan. Ev ne tenê ji bo zarokan in, lîstik jo bo her salî û li her cihê dikare bibe sedema gelek tiştan, wextderbaskirin, kêfxweşî, tenduristî, perwedehîyê. Sedema jibartina me ya vê mijarê ev e, ji aliyê ziman, çand, perwerdehî, xwezayîbûn û afirînerî di lîstikên zarokan de xwe bêtir dide nîşandan. Di lîstikên temenê wan mezin de ev afirînerî û xwezayîbûn li gor zarokan kêmtir in. Ji ber ku lîstikên ku dilîzin bêtir yê populer in û bêtir bi qûralkirî ne. Lê di zarokan de şikandina quralan hêsan e. Lîstikên zarokan bi pêşveçûyîna şert û mercan ve êdî nayên lîstin, em dikarin bibêjin bi pêşketina teknolojiyê ve telefon, tablet, kompîtur, televîzyon û hwd. amûrên teknolojiyê zarok di malê de hepis kirin, êdî zarok ji hevalan û ji lîstikan dûr ketin. Lê xalek heye ku mirov dikare bîne ziman ev e, lîstikên zarokan bi rengên cuda her tim berdewam dike dewsa ku lîstikên berê bilîze êdî lîstikên bi teknolojiyê ên sanal derketine pêş. Lîstikên dilîzin beşek jê jî ji yê xwendîgehê tînin lîstin hene ew jî li gor edeta mamosteyan in. Ev jî dibe sedem ku hin lîstik neyên lîstin û jibîrkin.

Pêşveçûyîna rewşa malbatan jî ji bo dewamkirina lîstikan astengî derxist. Gelek lîstik hene ku li kolanan dihat lîstin, bi amûrên qirêj ve dihat lîstin, an jî mirov dikare bibêje zarokan li hev dixistin cilên wan qirêj dibûn û diqetîyan, bi vî awayî mirov dikare gelek tiştan bibêje. Em dikarin bibêjin dema cilên paqij û biha ketin laşê mirov û malên wan, êdî malbat zarokên xwe dernexistin kolanan. Bi vî awayî ew lîstik jî kêmtir bûn û nehat lîstin. Ev rewş li bajaran bêtir li ber çavan in. Bi nêrîneke din jî mirov dikare bibêje ewleya di bajaran de kêmtir in.

## **6.1. Metodên ji bo destpêka lîstikan**

### **Bi dilxwazî destpêkirin**

Lîstik bi awayekî dilxwazî destpêdike, hin kes derdikevin dibêjin destpêkê de ez ê têkevim makê.

### **Ay May Qûmaray**

Di hin lîstikan de zarok li ser pîya, destên xwe didin ser hev û bi hev re her kes destekî ber bi jor û jêr dibin û dînin, di wê navberê de dibêjin ‘ay may qûm(b)aray’ dema ku ev gotin xelas dibe her kes alîyekî destên xwe nîşan dikan yan alîyê kefa destan an jî alîyê piştê destan, yên ji nav van yê kê ji yên din cudatir derkeve ew nakeve makê û yên din destên xwe dibin û dînin, ger 5 kes bin destên sisêyan vekirî yên du kesan girtî be, ev du kes ji makê xellas dibe, ger 3 kes destên wan vekirî be destê yekî girtî be ew nakeve makê, di encamê de du kes dimîne, yek wek dilxwaz alîkarîya wan dike û ji yên mayî yek dikeve makê.

### **Lingavêtina Berbihev**

Di hin lîstikan de jî du kesên bi qasî 5 metreyan ji hev dûr dikevin bi dorê her yek lingekî xwe didin ber yê din, ber bi hev tîngê kê li ser yê kê be ew serkeftî dibe û yê mayî wînda dike.

### **Şil Işk**

Kevirekî xwezî dikan, alîyekî wî şil dibe, paşê dibêjin “şil, hişk?” piştî wê diavêjin hewa dama ya kê rast derkeve ew dibe xwedîyê axaftina destpêkê an jî qezenç dike.

### **Hevalgirtin**

Kesên ku lîstik li ser dimîne re dibêjin ‘maka te’ an jî yê qezenç kirî re dibêjin ‘ête qezenç kirî’ destpêkê de yê qezençkirî biryar dide. Ger lîstik di nava du kesan de be yê qezençkirî despê dike, ku ji du kesan zêdetir be yê qezençkirî dest bi girtina hevalan dike, di gelek lîstikan de ev derdikeve holê.

## **Xelasbûna lîstikan**

### **Bi awayekî xwezayî xelasbûyîn**

Zarok birçî dibin, diwestin, şev dibe, malbatên wan gazî wan dikin, baran dibare, karen wan bi malbatî derdikeve û hwd.

### **Bi pevçûyînan xelasbûyîn**

Carinan di lîstikê de hevrapandin derdikeve holê, dibe ku heval li ser yekî tene dilîzin û ev jî hişyar dibe û paşê ji hev re xeberan didin. An jî dema lîstikê de canê kesên di makê de diêşînin, ev jî dibe sedama lihevxiştin.

### **Bi qezayan ve xelasbûyîn**

Di lîstikan de amûrên kup ê dilîzin dive ku bi şaşî li cihên hev ên hesas bikeve û bibe sedema şikandin an jî xwînbûyîna cihên laşê lîstikvanan. Dibe ku dema direvin li hev biqelibin û hwd.

## **Qînte**

Ev lîsik li cihên vekirî tê lîstin. Temenê lîstikvanan 6-14 wisa ye. Ev ji du koman pêk tê. Di vê komê de carinan ji yek kesî heta 5 kesan jî dibe. Destpêka lîstikê ji nav her du koman yek ji bo ku koma din têxe makê, yan kevirê alîyek wê hatiye şilkirin diavêjin hewa, an jî bi dorê ling diavêjin ber hev û yê winda kirî dikeve makê. Alavên lîstikê du dar e, darek mezin e ku 40-50cm wisa li gor zarokan e, darek jî bi qasî 10-15 cm wisa ye. Cehekî dîyarkirî heye, ev cih kevirê normal e, zarok ji ber wî kevirî bi darê mezin ve li darê biçûk dixin, ji vî darê biçûk re qînte tê gotin û ev navê lîstikê jî ji vî darê biçûk tê. Darê mezin di destekî de yê din jî di destekî de ye, qînteyê li gor xwe bilind dikin û bi yê din ve jî lêdixe, armanc ev e ku biavêje cihê dûr.

Yên di makê de jî mecbûr e yan qînteyê di hewa de pê bigre an jî destê xwe pê bike, ku hewa de pê bigre hemû lîstikvan di carekê de têk diçin û dikevin makê, ku qînte li hewa tenê dest pê bibe, tenê ew kesê avêtî heqê lîstinê winda dike û dibe dora hevalên wî. Ger destên kesekî ji hewa bi qînteyê nebe û qînte ki erdê bikeve û hîn nesekinî be lîstikvanên di makê de heqê wan heye bi lingên xwe ve li qînteyê bixe ji bo ku nêzîkî cihê kevir ve dema ku qînte li cihekî sekinî be, yên di makê de yek ji wan

wê qînteyê digrin û diavêjin kevir de, kesê ku qînte avêtîye ew jî mecbûr e bi darê mezin ve wî kevirî biparêze, ger qînte li wî kevirî bikeve ew lîstikvan jî têk diçe an jî bi gotina zarokan ew dimire. Paşê kesê di dorê de dilîze.

Ger yên di makê de wê qînteyê li kevir nekeve û li nêzî kevir bisekine, lîstikvan digrin bi wî darî ve ji kevir heta qînteyê dipîvin, ger dar bigihê qînteyê ew kes dimire, ger negihê, wê demê lîstikvan bi derê dest xwe ve li qînteyê dixê û dea qînte bilind bibe digre bi dar ve li qînteyê dixê û qînteyê ji kevir dûr dixê bi vî awayî sê mafê wî heye, ger dar qînteyê raneke û qînte piçekî jî bilive heqek lîstikvan diçe û dema ku bi darê mezin ve li qînteyê bixê û qînte tam ranebe hewa û lîstikvan li qînteyê bixê ev qebûl nabe, ji koma yên di makê de yek wê qînteyê digre û bi çavên girtî ve li ser pîya wê ber jêr berdide û lîstikvan bi mafekî windayî lîstikê didome. Piştî sê heqan dûrbûna ji qînteyê heta kevir bi lingên lîstikvan ve tê pîvandîn. Berîya pîvanê lîstikvan li gor dîtina xwe hejmarekê bi 10 û qatên wê hejmarekê dibêje, ger hejmara bi lingan ji 10î kêir be ew lîstikvan dimire. Mînak lîstikvan dibêje 30 û lingên xwe bi dorê dide ber hev û dijmêre ku ji 30î kêmtir be ew lîstikvan dimire û yê dorê destpê dike, lê ji 30î zêdetir be ew 30 piwan dikeve dest lîstikvan. Bi wî awayî armanc ev e tevahîya hejmaran ji 100î zêdetir bike dema ku hejmar ji 100î zêde bibe, ew caneke wî çêdibe, bi wî canî an jî bo xwe vedişêre an jî heqê lîstikekê dide ji hevalên xwe ên mirî, bi vî awayî lîstik didome.

### **Sobe'înî**

Zarok çî di nava rojê çî jî ber bi êvarê be di nav xwe de ji lîstikên dilîzin yek jê jî Sobe'înî ye. Ev lîstik wek cihên di nav kolanan de an jî ji cihên vekirî û girtî de jî tê lîstin. zarok ji vê lîstikê re bi tirkî jî vê dibêjin 'Saklanbaç', temenê lîstikvanan 7-15 ye. Zarok ji bo destên xwe bi cihekî bidin, cihekî dîyar dikin ev an dar kevir, dîrekên cêyanê, derîyek mala hwd. li cihekî nîşankirî dest bi lîstikê dikin. Yê di makê de heta hejmareke dîyarkirî bi dengê bilind dihejmêre, ev jimartin bi tirkî ye, dema digihê serî dîsa bi tirkî dibêjin 'Arkam önüm sağım solum sobe saklanmayan ebe'

Yê di makê de piştî ku çavên xwe vedike dest bi lêgerînan dike, zarokên xwe veşartî li bende fersendekê dibînin ku herin destên xwe li wî cihê dîyarkirî bixin û

bibêjin ‘sobe’ û di lîstikê de serkeftî bibe ku nekeve makê û hevaleyê xwe jî ji makê xelas bike. Lê ku yê di makê de wan kesan bibîne wan navan bi dengê bilin ve gazî bike û diçe destê xwe li wî cihê diyarkirî dixê. Em wek pênc kesên vê lîstikê dilîzin hesab bikin, du kes qezenç bike 3 kes jî were sobekirin, ev du kes digrin du hevalên xwe dijberin û yê mayî dikeve makê. Ger 4 kes wînda bike yek kes qezenç bike, ev yek kes hevaleyê xwe dijberê û ji wan sê kesên mayî kîjan zû hatibe sobekirin dikeve makê, ev lîstik bi vî awayî didome.

### **Tilî Pivûngê**

Ev lîstik wek cihên bi balkon heve an cihê vekirî tê lîstin. zarok ji vê lîstikê re bi tirkî jî vê dibêjin ‘körebe’ temenê lîstikvanan 7-12 ye. Bi rêbaza ay may kûmbaray ve yek dikeve makê û çavên wî bi çeffî an paçekî an jî li gor derfetên wê gavê bi tiştê ve tîr girêdan. Yê di makê de çavên wî girtîye, ew hewce ye desên xwe bi yekî bike ku ji makê derkeve, yê ew kirine makê jî bi awayekî bêdeng û bi dizî diçin pişt kesê di makê de û tilîyan pê ve dide. Bi vî awayî kenên xwe bi yê di makê de dikin. Di encamê de lîstik ya bi pevçûyînan diqede an jî bi awayekî xwezayî di nav xwe de biryar didin û diqedînin.

### **Pepsî**

Cihê lîstikê li cihên giirtî û vekirî debe, ji ber wê taybetîyeke mezin tune, cihê ku pepsî tê lîstin li gor lîstikê be bes dike. Amûrên lîstikê kapaxên li serê gazoz û soda hwd. e. Zarok wan qapaxan kom dikin û bi kevîran ve wan rast dikin, piştî rastikirinê li bi awayekî xwezayî yek pepsîya xwe dide erdê û yê din jî bi pepsîya xwe ve li wê dixê, ger pepsîya erdê rabe, yanê berovajî bibe yê ew rakirî dibê xwedîyê wê pepsîyê, bi vî awayî heta ku yek hemûyan ji yê din bistîne didome. Carinan açîk-kapali, destpêk açîk –kapali (cihê renklî)

### **Uç Qafa**

Ev lîstik bi gogê tê lîstin, li cihên vekirî tê lîstin. Temenê lîstikvanan 6-30 e. Ev lîstik bi 3-10 kes dikare bê lîstin. Navê lîstikê ji sê xolên bi serî ve tîr avêtinê. Armanç yek têkeve makê û lîstikvan jî ji hev re gogê rabike yek bi serî ve xol biavêje

qeले û wî kesî ji listikê biavje û bi vî awayî herî dawî du listikvan bimîne ku ew di listikê de serkeftî bibin. Ew listik ji aliyê keç û jinan nayê listin. Kesê di destpêkê de bi dilxwazî dikeve qele(makê) ew ji ber ku yê yekem e û bi dilxwazî dikevê em sê heb gol bixwe jî ji listikê dernakeve.

Qûralên listikê wisa ye û carinan di nav xwe de jî diguhere, tu kes li pişt hev nikare du car lingên xwe li gogê bixe, dema cara duyem dike lingê xwe li gogê bike ji yê di makê de destûr dixwaze dibêje “lêxim?” ku yê makê bibêje erê ew ji bo carekê lingê xwe li gogê dike ger yê di makê de bibêje na, ji hevalên listikvan yekî din tê lingê xwe gogê dike. Listikvan ji hev re gogê bilind dikin ji listikvanan yên derfet dîtî jî bi serê xwe ve gogê diavêje qele, ger ew xol bibe ji heqê mayî yê di makê de dimîne dudu, lê yê di qele de wê gogê li hewa pê bigre dibe maka ew kesê gog avêtî, carinan li gor qûralên wê dema kesêk bi lingan gogê bilind dike yê di qele de wê gogê li hewa bi dest pê bigre dibe maka wî kesî ger here derveyî qele îja dibe maka kesê gog avêtî, kesên bi lingan jî gogê biavêje derveyî qele dikeve makê. Carinan li gor qûralên wê gavê bi taybetî jî dem hejmara kesan zêde be, dibêjin kesên bi zanîn an şaşî lingê kê bi gogê bibe û ew here qele, dibe maka wî kesî jî. Hin qûralên li gor rewşan heye ev bi kesayetên di listikê ve eleqedar e. Mînak dibêjin dma yek xol biavêje û ev gol di nava lingên yê di makê de here ew hema carekê de ji listikê tê avêtin. Di vir de bêtir ji aliyê cinsî ve jî nêrînek heye weka ku nav ling weke namûs e û namûs çûye, ev ê di makê de jî bi awayekî henek lê tê kirin ji listikê derdikeve. Kesên sê xol xwarîye dema ji listikê derdikeve ji bo têkeve makê ji listikvanan yekî dixwe makê, bêtir kî kê ji listikê derbixe, yê di makê de dixwaze wek tolhildanê wî jî bidin derxistin, wî kesî dixin makê. Dîsa li gor şertê kesan kesê derketî nikara careke din têkeve listikê, carinan wek ceza heta cihekî dîyarkirî direvin, armanc heneklêkirin e. Carinan jî ev qûral sist e, kesê derketî ji listikvanan yekî derdixwe û dikeve listikê ew jî bêtir li kesên ji salê xwe biçûktir tên kirin, lê yê derdikeve, yanê dewsa xwe yê ji makê derketî dike listikê, ew gelek caran bi dilxwazî dibe. Ji ber ku yê ji makê derketî bêtir henekan dike kêfa listikvanan jê re tê, jixwe armanca listikê kêfxweşî ye. Bi kurtasî yê sê xol dixwe ji listikê derdikeve û herî dawî du kes dimîne paşê listik bi dawî dibe.

### **Keviravêtin**

Ev lîstik li cihên vekirî tê lîstin, li gor temen 5-20 wisa tê lîstin. Zarok li gor qeweta xwe keviran dijbêre, xêzekê li cehekî dikşîne, ew xêz dibe sînor. Kesê ku kevir zêde biavêje dûr ew qezenç dike. Carinan di nav xwe de biryar jî digrin, ji nav hevalan ger kî yê herî dawî be, ew ê wek keran bizire. Şertên bi vî rengî jî li gor wan tê dayîn.

### **Nîşangirtin**

Ev lîstik li cihê derve tê lîstin, amûrên lîstikê ji der û dor çî çopan tînen komkirin. Temenê lîstikvan 5-25 e. Keç nalîzin. Şûşeyên hatine komkin datînin cihekî dîyarkirî û bi keviran ve lê dixin, ev kevir avêtin bi dorê ve tê avêtin. Yê serketî kêfxeş dibe, lê carinan şertan jî didin ber hev, ger ez qezenç bikim tu yê wek keran bizire, an tu yê ji me re tiştêkî bikire û hwd.

### **Çixzîya gilover**

Ev lîstik li cihên vekirî tê lîstin, temenê zarokan 8-15 wisa ye, keç nalîzin. Bi komkî tê lîstin, 10 kes jî dikare bilîze. Lîstikvan xêzeke gilover li gor xwe çêkidin. Gulover bi qasî du metreyan e. Bi rêya ay may qûmaray ve yek kes dikeve makê, yê dikeve makê dikeve nav wê guloverê.

Lîstik wisa tê lîstin, kesê kutkeve giloverê dikare her du lingên xwe dayînin, ku ji wê giloverê derkeve mecbûr e, lingekî xwe rabike û li pêy hevalan bikeve û wan têxe makê. Dema ku kesê di makê de ji giloverê derkeve û destê xwe bi yekî bike, êdî ew kes direve ku têkeve wê guloverê, ger nekeve wê giloverê, lîstikvan diçin bi kulman li piştê wî dixin. Heta ku têkeve guloverê jî lêdixin. Piştî ku ew dikeve guloverê ew jî bera hinkesên din dide. Qûralek wisa jî heye, ger lîstikvan bixwaze dema ji yê guloverê derdikeve, ew jî ji paş de bi dizîka here têkeve guloverê û destê xwe bi yê makê bike, ji ber ku her kî lingê xwe têxe wê guloverê dibe maka wî, bi vî awayî bi dizîka diçin û destên xwe bi yê ji guloverê derketî dikin û bi kulman li piştê wî dixin. Bi vî awayî lîstik didome. An bi pepçûnekê an jî ji biryara navxweyî hatîye girtin lîstik bi dawî dibe.

## **Cit Vit**

Ev listik li cihên ber av, an erq, cihên av lê sekinîye û hwd, yanê cihên ku av û ax hebe tê listin. Ger cihek wisa xwazayî nebe tê çêkirin, avê digrin û li gor listikê cihekê şil dikin. Keç û kuran dilîstin. Temen 5-17 wisa ne.

Lîstik bi awayekî dilxwazane destpêdike. Zarok dar(ço) peyda dikin, ev dar li gor wan e qasî nîv mîtroyî ye, zarok bi van daran ve cihên ku ax hinekî nerm be, yanê ji bo ku dar di erdê de cit bibe cihê guncav dibînin, navê listikê jî ji vî deng tê. Dema ku ço ser tîkê dikeve erdê dengê derdikeve re dibêjin cit. Navê vit jî weke pekenokekê bi ji listikê derdikeve, dema darê yekî li ser tîkê di erdê de be, listkvanê din jî digre darê xwe li darê wî dixê û armanc ev e darê wî darê hevalê xwe bixe erdê û ser de jî divê ew de di erdê de cit bibe, weka pêkenokekê divêjin wek cita te vit bû. Bi vî awayî bi dorê ve listik berdewam dike û bi awayekî xewazî xelas dibe.

## **Gulleberdan**

Ev listik li cihên girtî û vekirî dikare bê listin. Temen 4-15, carinan kesên temen 30 jî dilîzin lê ew ji bo zarokan dilîzin, ne bi hevsa lê xwe re. Keç û kur dikarin bilîzin, lê bêtir kur dilîzin. Cihekê qam hebe (kaş) ev listik tê listin an jî ev cih bi xwe tê çêkirin an bi kartonekê, defterek, balîvekê û hwd. li gor daxwaza listikvanan tê çêkirin. Destpêk bi awayekî dilxwazî yek bi xwe destpêdike. Gule ji jor tê berdan ya kê li ya kê bikeve ew hemû guleyan digre. Dema listik zû xelas bibe yê qezençkirî bi deyn jî guleyan dide yê li hember, carinan jî ji ber ku gule hemû yê yekî ye, ew bi dilxwazî li hev parva dikin, dawîa listikê de xwedîyê hemû guleyan dîsa digre. Di listikê de ger guleyên di dest de xelas bibe, vê carê ji erdê her kes li gor biryara xwe 2 heban digre û listikê berdewam dikin.

## **Gulle ji kortê derxistin**

Ev listik li cihên derve û zemîna wê rast tê listin. Temanê zarokan 5-15 wisa ne. Bi du kesan ve tê listin. Armanc gulle qezençkirin e. Guloverek tê çêkirin û du-sê metreyan jê dûrtir xêzek ji bo ku ji wir destpê bikin tê çêkirin. Destpêkê de ji her du alîyan bi biryarên xwe ve 2-5 guleyan dixin wê gortê, bi rêya ling avêtina ber hev an jî şil hişk yek destpê dike. Paşê her du diçin pişt xêzê û yê destpêkê dest bi listikê dike.

Armanç wan guleyên di kortê de ji kortê derxistin e. Ger her du nikaribe ji kortê derbixe, dîsa bi dorê yê destpêkê avêtibû, li cihê ku guleya wî ji kortê sekinîbû, li guleyên nav xêzê dixê û wan derdixê, kîjan ji wan were derketin ew tê qezençkirin. Kesê ku gule ji kortê derxê heqê wî heye berdewam bike, dema ku gule ji kortê dernekeve yê din dest bi lîstikê dike. Bi vî awayî heta dawîyê tê lîstin. Dema ku gule di dest yekî de nemîne, tenê ya dest wî mabe, yê gule dest de, ji dest xwe yekî dixê guloverê û ger ew her duyan ji komê derbixe, êdî ew jî dibe ya wî. Bi vî awayî xelas dibe.

### **Gulle lihevaxistin**

Lîstik li cihê vekirî û girtî dikare bê lîstin, lê divê ew cihê girtî nebe asteng. Temenê lîstikvanan 5-14 wisa ye. Bêtir kur listikê dilîze. Her du lîstikvan ji hev dûr dikevin, dibêjin “ez li vir” bi lingê xwe ve cihekî nîşan didin û hêdî hêdî ber bi hev tî, ji wan yek kî bawer bike ji wê dûrahîyê li guleya wî lê bixe dibêje “temam”, yê li hember guleya xwe dide erdê û yê gotîye tamam guleya xwe diavêje li wî guleyî dixê. Ger lêkeve wê qezeç dike, carinan jî li gor xwe şertan dibdin, mînak dibêjin kî qezenç bike ew ê 3 guleya bide min. Dema ku gule lê nekev yê ku danîbû ger bawer bike ew ê lêbixe diavêje lêdixê, ger bawer neke dibêje ez tuneme û dîsa dibêjin ez li vir û berdewam dikin.

### **Dirdiqç**

Ev lîstik li baxçeyan an cihên vekirî tê lîstin, lîstikvan zarokên kur in. Temen 6- 15 wisa ye. Bi rêya ay may qûmbaray ve yek dikeve makê. Yê di makê de her du destên xwe dide ser cinî(gûzek) yê lingên xwe û ber bi jêr xwe xwar dikin. Li gor daxwaza zarokan qama yê di makê de eyar dikin, yê di makê de bi awayekî xwe xwarkirî sabît disekine. Zarokên din jî bi awayekî xwezayî xwe ji ser wî yê di makê re diavêjin, di vir de hin qûral hene, ev weke cureyên lîstikê jî dikare bî hesabkirin.

Kesên ku xwe ji ser re biavêje dibê destên xwe an laşê xwe bi tu awayî ji yê di makê de nekin. Ev hêz û qabîliyeta lîstikvan dide nîşandan, ku pê kêfxweş dibin. Dikarin destên xwe bidin piştê yê di makê de ji bo xwe bilin bikin û derbas bibin, lê di vir de li gor zarokan ji bo ku di yê makê de bikenin, destên xwe vedikin û hişk li piştê

yê di makê de dikin, an jî qurîncok(perîncok) dikin. An jî dema ku ji ser yê di makê de derbas dibin, lîstikvan di vê navberê de ling xwe li qûna yê di makê de dixin. An jî terlikek, pêlavek wisa hebe dema ji ser yê di makê re derbas dibin, wê li qûna yê di makê de dixin, bi vî awayî henekên xwe di yê makê de dikin.

Ger kesên ku li gor quralan tevnegerin hebe ew dikeve makê, mînak ku yek dema xwe i ser re biavêje li gor qurala yekem cihek laşê wî pê bibe. Li gor qûrala din jî divê dema kesek xwe ji ser yê din re diavêje, dive nebe sedam ketina wî, dibe ku carinan yê xwe ji ser re diavêje nikare biavêje û her du bikevin erdê, ew dikeve makê, dema ku kes bi wayekî bilîze, yê di makê de bi destûra lîstikvanan qama xwe bilin dike ku zehmetîyê têxin kîstikê. Bi vî awayî lîstik berdeam dike û bi awayekî xwezayî xelas dibe.

### **Yeko Diko**

Ev lîstik di nava malê de tê lîstin. Temenê lîstikvanan 3-15 wisa ye. Gelek caran di nav de yekî temen mezin jî heye. Ev temen carinan 80 jî dikare bibe. Her kes lingên xwe didin ber hev ji nav wan yek hin gotinan dibêje. Carinan berîya vê gotinan, vebêjer tîya xwe ya nîşanê dide ber devê xwe û bi awayekeî gulover dizivîrîne dibêje “ooo ooo ooo” û berdewam dike. Bêtir ev kesekî temen mezin e, piştî ku zarokan fêr kir, bi wan dide gotin. Bi her kiteyekê de, yê ku wê gotinê dibêje ji lingekî derbasî yekî din dibe. Ev gotinên bi melodî wisa ye: “oooooooo, Yeko diko di tirkî, heft henara çizirkî, kêrgî bera xezal da, xezal revya ser darê, pîr e bo ka ber ma lê.” Piştî ku ev xelas bû, tîlîya vebêjer li ser kîjan lingî be, ew ling ji lîstikê derdikeve bi vî awayî hemû ling derdikeve tenê yek ling dimîne. Vê carê ling û erd bi vê melodîyê ve tê lîstin ku kîjan bimîne bi awayekî henekî bi kulmên sivik ve li wir dixin. Vê vê lêxistina nerm kêfxweşîyek derdikeve holê.

Li gor derfetên me, me behsa van lîstikan kir. Hin lîstik hene niha nayên lîstin min bixwe jî jibîr kirîye, Gelek lîstikên me behskîye bêtir lîstikên kuran in. Her weha gelek lîstikên ên me nenîvîsîn jî hene wek: Qozî, Nahtik(kevîrê pahn), Kortik, Îsqa bîr, Tompûz-Qiliç, Çixzî, Toşş (7 kûle), Fik(dama), Berahevdan, Qûnvedan, Delo (pênc kevîr), Konê pîrê(lîstika bi ta) û hwd.

## **BEŞA ŞEŞEM**

### **EDEBİYATA GELÊRÎ**

Edebîyata gelêrî, di xebatên folklorê de cihekî girîng digre. Di warê folklorê de Keskin wiha dibêje” Bi giştî weha tê zanîn ku folklor, wek disiplineke akademîk, li herêmekê an jî welatekî li ser berhevkerin, polînkirin, arşivkirin û analizkirina berhemên çandî radiweste. Berhemên ku folklor berê xwe dide wan jî bi gelemperî ew berhem in ku di nav tradîsyona çanda devkî de hatine afirandin û dîsa di nav wê tradîsyonê de hatine veguhastin. Di nav wan de jî cureyên edebiyata gelêrî cihekî sereke û girîng digirin ku di lêgerîna çanda xwe de rewşenbîr û lêkolîneran berê xwe daye wan.”<sup>13</sup>

#### **6.1. Çîrok û Meseleyên di civatê de tê behskirin.**

Go e dikim herim eskerîyê bêxwedî mi kesî mi tuni. Go hatimi vira, meta me zanîbû vira. Go bê ma Ebê Semhût kes mîratxurê me tuni. Go em mîratxurê hev î. Bavê te digo, go e çûm go sîlihik mi hebû, niza wele go jî niza navê wê çî yi, a go rihmetlîyê Semhût a bavê vî Qefê Semhût ji mi girt, go seata mi hebû go seata mi ji mi girt, kir destê wî qefoyî, go bi soz tu heri eskerîyê biki weri em ê bi te di. Go ew gustîla mi jî sîliha mi jî go wer çavê mi lê yi, a go çavê mi wer lê yi a wan wer xwar a go wana mîratxurê me yi.

Go va Hemreşkê Fîtoxlî fit î, go kesî nikanîbû wî bixapanda, go ez im, ew î, Sînê Eyo yi, Ebo yi, bi deva derin Poro, bi kirê yi. (deveyê xwe ve bi pere kar dîkin). Go me gîşa da ber û go wî jî ê xwu dagirt, jînkê paşî kirê go wî debokî di bera ser ê xwu da, go jînkê deng nekirîyi qey gotîyi bira qe, go çû go em hatin, gihani kîderê, go

---

<sup>13</sup> Keskin, Necat, **Roja Nû û Edebîyata Kurdî Ya Gelêrî -1 (çîrok û Serpêhatî)**, Weş. Avesta, Stenbol, 2018, r. 9.

gerek em mîzekê bi deva din(ji bo deve mîza xwe bike disekin), go rihmetlîyê Sînê Eyo meznê me bû, go Ebo, Şêxo, Hemreşk, go hûn di nav destîyê xelkê ra çû, go eger sibe ron bibi, em mîzê bi deva di, em tişkî bi kê ra bibîni, em ê di ga hev ni, em ê hevdû bikuji, go rihmetlîyê Qefê Qado gotîyi e jî hevalê we mi, go me go bira bi, go devê te tuni, tu jixwa bêlome bi qandî diki heri û go hat, go fena gi em hat gîha bënderekê, go me mîz da deva, go me wa kir, şeqa şeqa kef(pê palîyê dikin, mîna tarê bêjînga yi) û dasa yi. Go rihmetlîyê Sînê Eyo çû go Hemreşk go me nego em ê di ga hev ni? Go çi la mi çerkirîyi? Go mêrik nigê xwu lêxist go va çi şeqişeqi, te dahsê mêrka û kefa mêrka abîyi, em ê di ga te ni, ya kirê ji me ra yi ya tu yê bibi cî, go rihmetlîyo go ne dest bi ser devê mi di ne ser ezenca mi di, a go bir anî nav tenê wan û hat.

Bavê te go carê jî em birçî ni, go ez û Ebo go va Ebo mîratxwuré wî bû, Ebo meznê wî bû tim bi wî ra bû. Go ez im Ebo yi, Sînê Eyo yi, Hemreşk i, Semhût i. Go gotîyi hadê em herin, wa yi mal heyi, hadê em her kê ji xwu ra bê ka nanekî bi me di, em herkî perçakî bixwi bes i. Go Sînê Eyo yi gi Qefê Qado yi gotîyi em ê ji xwa li vir bi, çuyî ser mêrik ra sekinîyi, mêrik kulavê şivana didirû, go go selami elêykum, elêykîme selam, go go keke tu kani tasek avdew bide me, go mêrik wa nerî go keçe jinik, vana benzê wan, benzê birçîya yi, ne ê avdewê yi, heri her kê jê ra nanekî bîni. Go jînkê her kî nanek da me û Hemreşk gotîyi Şêxo, ha, la em birçî ni, nanê destkî em ê çi bixwu çi bibi ji wan ra, ka em ê bixwin û em ê bèn nedayi me. Go Hemreşkê tim kirîyi miçûmiç û nexwarîyi. Go gotîyi Şîno Şîno gotîyi weli weli em nanê xwu bixwi, hima bavê te wa sekinîyi, gotîyi Ebo weri weri ji ta jî anîyi, Semhût tu jî weri bixwi. Bavê te diha cîda sekinîyi, gotîyi law nanik da me, me her da tev nexwar, gotîyi mi te xapand, mi nîha te mi te xapand. De şala tu û semhût li hev xi em jî temaşe we bikin. A ser wî nanî Hemreşkê gotîyi mi Şêxo xapandîyi. A semhût jî gotîyi e di te nim e naxwim, ma da gi wa kirîyi lê helal bi, birazîyê mi ni lê helal bi, em ê ça ji bo huqa nan em ê pevçînin tu jî temaşe me biki. (E.D)

Vevêjer: Mahmût Tum(75) 10-12 salîya xwe de ji apê xwe Hesên Tum guhdar kirîye wê demê apê wî(nêzî 60 salî wisa bûye), Hesên jî ji apê xwe Silo guhdar kirîye.

### **Mar û Mirov**

Dibê yek ji xwa li ber pezê xwu bûyi. Radikevi gi çito dibi bîna nêni deri mêr, Mar tê avira wî digri Şîyar dibi mar dibê tu xwu bilivîni ez ê bi te bigrim. Dibê xirabîya mi zirara mi negîyayi te law tu çira diki mi bigri dibê tu hema xwe bilivîni ez ê te bigrim. Dibê mi megri dibê em her ji kahnîyê ra bê, kahnî go pêbigri bi mi bigri deri dibê ya kahnî yanê kanî av tê dizê ho tu fam diki, dibê law pê bigri dibê wicdanê însan tune. Dibê kahnî çî xirabîya mi gîhayi te, dibê çaxa av ji mi dihat ava mi we vî gundî gîşa dihat av dibir xêra mi we av vexwar dibê niha ava mi kêmbûyi, dibê zarê we tê çavkanîya mi da dirî yi. Text û bextê we însanan tune, teselîya wî dikevi dibê ga wa ye wira yi em herin cem ga, ga go pê bigri, bi mi bigri. Deri cem ga, Ga dibê law pê bigri dibê text û bextê wî tune, dibê çito text û bextê wî tune, dibê waxta e cange bûm dibê pir qîmet da mi û dibê ka dida ber mi, dibê bi mi cotê xwe diki, dibê e niha pîr bûmi mi salme kirini, malê mi vir berdani. Ne diranê mi heyi ne tişkî mi heyi e bixwim. Ê însan pir şeytan i heşayî te, va dibê rêvî wa yi, rêvî ra awa diki, dibê tu mi xelas ki ez ê du mirîşka ji ta bînim, rêvî dibê welle text û bextê însan tune. Jê re wiha diki ez ê j ite ra du mirîşka bînim. Ê va rêvî dibê ya çî zirara wî pê megri ew jî însan i ew jî malekî xwedî diki bedri, deri dibê jinik dibê çî, dibê tu wa tajîyê mi bîni e ciher kim têr hebû (te têr te dî? te têr nedî) her tajî diki ewê û a rêvî dibi xirbêsan (li cihekî gundê Qereqoyinê yê girêdayî Sêwrekê wek mînak dide) dineri mêrik wa ye ker û welle rêvî dêla xwu ba diki ba diki pêrgî deri û tajîya, li rêvî rast diki. Law rêvî dibê mala te şewityo mi heyata te xelas kir law te dikira du mirîşk bianîya. postê wî pere diki? Tajî didiri yek ji wê de tê yek ji vê de tê, rêvî perçe perçe diki.

### **Sê Mihemed**

Berê telebe didan xwedî bi kuranê (jê ra dibê çî? Ser zimanê min i ez nizanim dibê yanê dîrî gund mîna mektebê çêdikir(medrese)) medrese medrese medrese dêmek em bê berê awûqat tunebû muftî muftî kê pir quran dixwand ya dibû qadî ya dibû muftî wa welata her qezak her wilayetek muftîyak hebû, xelk diçû muftî dişewirî

digo tişkî me wa bûyi şêxo tiştê me birîyi, em mêrik digo çi, malê mera deri îmana mera deri îmana mera deri. Goreyê quranê rî însana dida digo xalê şêxo girtîyi.

Mêrik ser mesele em wer bê bêna medresa wan li dîyarê ereba bûyi dûr bûyi telebe dayi xwendin gundkî mîna gundê me şên dibê ka em xocê xwu bizewicinî dinê guneyi law mêrik zarê me gişa didi xwendin dibê zara didi xwendin xoce salê carê tê mal tê jina xwu dibîni bi ro hevdu nabîni bi şev hevdû dibîni xwedê lawekî didi nav mihemed lê diki, mêrik car sal diqedî car tê navê wî mihemed lêdiki telebê wî dineri xoce yek pînc oxlî pînc i, berî xoce deri jinka feqîr mêrkê xwu bi ro nabîni bi şev dibîni wî îşî pê diki mêrik qêpî vediki jinik dibê xoce efendî te anha hat te xêr i silametî yi xoce fam diki. Dibê jinik bi erebî dibê humma dibê wellehî mi tizbîya xwu bîra kirîyi bira jinik qal neşkîni ê sûncê jinkê jî tuneysi.

Xoce emeklî dibi vana dibin peya mêrik tim dibê malê mi ji du mihemeda ra ne ji yekî ra, hela hela gundî dibê xoce ça tu wer dibê, û vana mezin dibi û bi hev dikevin ev dibê filan ew dibê bîvan ya gundî dibê li hev mexin dibê qadî vayi li kilîsekê yi herin cem muftî qadî û wana ra bê. vana jî zarê xoce yi wer xwendini bi goreyê histêrka tu ji wê da tê tu lawê Şêxo yi(kalikê min) tu lawê Elî yi navê ga te Xecê yi, navê pîrka te Emo yi(mînaka malbata min dide), hela hela yarebîm va çito wer dibi law mêrika êrif in yanê vana wer bi quranî kerîm bi histêrka, vana digê hinda rezê Qereqonya(bi tirkî; karakoyun, 15 km li dûrê sêwrekê ye) diki heri Kilîsekê(nêzî gundê Qereqoyinê ye wek mînak dide), êvar i payîz i yekî Erebi ji wê da tê lê diqelibi, dibê law dibê law Erebi tê xêr i law, dibê welle devê mi wenda bûyi, yek dibê deva te gewr bû, dibê er rihmet bavê te bi welle deva mi gewr bû, ê di dibê law dora milikê wî birq fikir seba gurî nebi, birq demek qetran dêmek, qetran tu zanî çî yi va zift i ha, ê di dibê law hefsalê wî a wa bûyi, dibê hu devê mi we dizî yi dibê e we bernadim dibê, dibê zatî em ki heri cem kê, law oxil dibê em e tirêr i, em filan lawê xoce ni me xwendîyi me deve tew nedîyi me ji xwa texmînî va gotîyi dibê hûn derewa diki, deri mêrik nêna datîni erebi wa rûniştîyi û nan deri û tê yek dibê law welle şîva me xweş i, va şîva me genimê wî nav mezela, bîna mirya jê tê law, êdi dibê yanê miftî xurt i, dibê goştê ser birxur dibê goştê ehsan i, ehsan dêmek goştê dibê goştê cewrikê kûçkan, êdi dibê law

Tew ne dolê bavê xwu yi law mêrik dibê ava va çibû law gû xwu da law, ereb devê wî ji hev deri ereb êdî çî bibê ereb salme yi qula ereb da weri, vaya nan datîni deri ban dîya xwu diki, dibê anê bilxurê me ji ku yi, dibê welle lawê mi ewê kêleka mezela dibê genimê wî tox bû me kir bilxur, ê dibê va goştê ser bilxur çî bû dayê, dibê wellehîn berxa me, ga wê mir û dêlka me ber malê terix bû wer şîrê dêlikê xwar yanê wa berxa bi dêlikê mezin bû. Ê dibê dayê te het tişt doxrî got, e dolê kê me? dibê tiştê were heyi, tu dolê bavê xwu yi. Dibê anê te du tişt doxrî go vîya jî doxrî bibê bira dilê me rehet bibi jinik dineri çare tuneyi, ew ê mêrik bikuji dibê welle lawê mi em pir zengîn bû bavê te yexfîyar bû ez jî gênc bûm berê rênçber digot evd evd dêmek kolê kole dêmeg, ji niha ê reş ra zincî, ji welata dihati xelkê dikirî, (digo mahmût tu kolê xwu nafroşi digo e difroşim em gihan kola a va Ereboxli(nêzî gundê Qereqoyinê ye wek mînak dide) hebû kolê mala Saqî beg hebû) ê tamam dayê tu doxrî dibê.

Dibê selamûeleykum eleykimeselam xêr i law çî yi çî mesele yi, dibê welle xoce muftî em hat cem te ereb jî li me qelibî, me ji ereb ra got deva te wa yi, dibê te deve dizî yi, dibê law Ereb mêrka êrif in rabi heri mala xwu deva te nedizîyi, dibê na welle vana deva mi dizîyi. Dibê ereb tê zirar biki dişîni mêrik mêrik zengîn i xwedîyê gund i, muftî dêmek hakimê niha dêmek i. Va dişîni berxê mêrik, berka vedîqetîni bê mêrka, berxê mê didi hêlkê ê nêr didi hêlkê, yeki mê bera nav ê nêr didi, yekî nêr jî bera nav ê mê didi. Ê nêr rohilat da diçi, ê mê roava da diçi, dibê rabi law ma pezê mi herikî berxê mi herikî, ban zarê xoce diki, ê mezin deri ser şopê dibê xoce berx bûyi du birr, ê ortê dibê berx bûyi du birre berxê mê bi hêlkê çûyi berxê mê roava da çûyi berxê nêr rohilat çûyi, ê dûra lawê xocê di dibê, dibê berxek mê tevî ê nêr i, berxek nêr jî tevî ê mê, yanê berxek mê tevî ê nêr i, berxekî nêr jî behem çûyi tevî ewê. Dibê berx ku da çûyi dibê yek bi roava da çûyi yek rohilat da çûyi qadî sîlakê li Erebi dixi dibê ereb rabi bicahmi heri mala xwu.

Vana radibi, dibê îşê we çî yi? Dibê welle qazî dibê bavê me her du malê me ji du mihemed ra, yekî ra nini. Ê dibê bira ereb heri em ê li hevdu rûnin li hev rûdinin yanê mi niha got hevalê te heyi ser meselê lo hevala ta keçik heyi ê heval normal i du tene ji gund pir ji hev pir hezkirî, çî qas xwastîyi nedayê, (me bi xwu jî, mi ji yekî hezkir mi xwest xelkê neda me) keçik jî vî lawkî hezdiki,, keçik bîna keçkê teng dibi

keçik dahsa xwu digri deri qırşika deri qırşika, rabû (berê kesî nika, anha anha e kanim herim ji xwa goşt moşt bînim werim berê tişkî wer tunebû, ya mîya mera yi, ya gayê mera yi, ya manga mera bi goşt me didî goşt moşt bajêr nedihat. Lawik tahjîya xwu digri deri cem keçkê dibê e te bernadim ez ê te pîs bikim, keçik dibê tu çiqra ji mi hezdiki ez jî huqa ji te hezdikim. Dibê qarîş mi mebi, e rîya bûmi bûk bira ez nerim mala xelkê, e rûreş nebim yanê e jî eksûg im, namûsa mi jî heyi çî qas namûsa te heyi a mi jî heyi. Sonda berê dibê sozê mêrê berê yi. Sozê mêrê berê diha pêximber i xwedê yi kî yi e nizanîm dibê ez ê wer waad bikim, soza mêrê berê bi ez ê şeva ewil werim cem te. Lawik dibê tamam herdê mezna dibê eferim ê çûk dibê welle ez bama mi bernedida, de bîst sî keçik û genc û wexta mi ni, yazî diki sê meh salik dikevi ortê çar meh dikevi ortê va keçka deri cem mêr. Keçik êvarê ban xwesîya xwu diki talî ro deri ava bûk deri malê xwesî ji bûkê ra şîret diki, du tene pîrekê munasib deri dibê, mêrê te yê weri cem te edet i, edet i edetê rî didê. yanê mîna gi bira sorin dernekevi ho zatî berê me kes kesî ji hev heznedikir. Diçû yek ji Qerqelîyê(nêzî gundê Qereqoyinê gundek e. Wekî mînak dide) xwest ga te û bavê te qayîl bû tamam.

Me tew hevdu nedî e werim e sîlakê lêxim bitirsi tişteki bibi çok bimiri tew pîrek her tiştî hazir diki û diha merî, qey îlhez dibê xwesî filan derê filan merî hatîye pêşîy mi gerek ez, ban lawê xwu ki bira weri vira, jinik deri ban lawê xwu diki dibê, mêrik e ji filan merî pir hezdikim lebelê gerek tiî, e şeva ewil herim cem wî, gotîyi çî gotîyi filan derî hat pêşîya mi ez û wî û xwedê tenê hebû mêrik tişteki bi mi nekirîyi. Mi va soza dayî mêrik dibê herî, herdê mezna dibê eferim ê çûk dibê welle ez bama mi bernedida yaw çito yanê, mi ji xwu ra xwastîyi anîyi kirîyi mala xwu.

E gi qolçî yi qaçaxçî ni eg polîs e eg pêyê mêrik hebûyi, ya dineri bûk û hat malê dibê qîza mi va çî yi karê te li mala me çî yi? dibê wellehîn lawê te li filan derê hatîyi pêşîya mi, Tişkî xirab bi mi nekirîyi mi soz dayê ez hatimi. Lawik tê dibê tu ga mi ni tu xwa mi ni tu ronya çavê mi ni. Dibê eg 50 mî 100 mî yi vêra dişîni 20-30 devakî vê ra dişîni zeyîya wê ha çend hespa dişîni diki ber peyê xwu dibê vê jinkê bibi berdi mala mêrik dibê mêrê gi jina xwu çito dibi yaw pir namûslî bûyi va. Dibê tu ga mi û xwa mi ni ez, em xwey û birê hev in. Herdê mezna dibê eferim ê çûk dibê ez

bama wellehîn mi bernedida yaw çito e vî berdim û qadî dibê keko malê xoce ji we herda ra yi, a di vî da tişteke tuneyi. Silakî lê dixi deri.

### **Mehmet Xerîb**

Dibê zemankî gundkî mîna gundê me(Qereqoyin) pir şên bûyi, lawê yekî pir rind bûyi çîqa pîrekê gund heyi gotîyi em ê gişê bigrin cem xwu. Law gotîyi aman hewar e yekê bixwazim e dudya bixwazim mêrik ban, gundî top dibi gotîyi wer keko ya mala xwu barki, qîzê me diki weri mala hev, law mêrik dibê e ku da herim law aman hewar, dibê ya em ê lawê te bikuji ya tu yê barki ê dibê mala mi mekuji mala xwu bardiki û berê deve hebû barî deva diki û keryê pez û berê xwu bakur da diki û diheri, deri zozanan zîk tepakî datînin law kes tuneyi jinik û mêrik û lawik i.

Deh ro dikevi ortê bîst ro dikevi ortê dineri konek tê li kêlekê datîni. Wa jî qîza wî pir rind bûyi gundekî di gotîyi, Ew dibê vê qîzê bide me ew dibê vê qîzê bide me li ser wê qîzê li hev dixi. Mêrka ban diki dibê binêr ya xwu barki. Em ê kê qîza te bixwazi em diki hevdu bikuji gund tev boy qîza te. Mêrik bandiki bavê lêwik gi berê mîvan bihata em niha mîvanik em wer bê weri kêlek me dêni gerek em bankê şîvê bidê. Dibê tu bi xêr hatîyi te li kêlek mi kon danîyi, dibê ê te çîyê te heyi mêrik ferq diki keçik û lawik û mî jî bi hêrik, dibê ê mi jî ez im keçkek min i û jina min i. Mêrik gi bi telefonê bi gi bi çî telefon wê çaxê tunebû, jina xwu ra dibê bira lawê mi çekê pîreka li xwu ki. Çekê pîreka li lêwik diki, lawik ra dibê ti gerek tu çavê xirabîyi li vê kîza vî mêrikî mêze meki tu mêzeki se ew ê heri em ê rezîl bibi em ê tenê li vir, Mêrik taqîp diki bavê çekê dineri law dineri mîzê da, mîza pîreka ayrî yi a peya ayrî yi. Rokê ji qîza xwu ra dibê ji xwa xwu ra bê em her têkevi golê, hûn derin kiçka ji xwa têkevin golê û gol dibi çem dibi kahnî dibi yanê em pêsîrê xwu li rî hev di. Deri lêwik ra dibê lawik ra dibê hekê em xweyingê hev in, gerek naki tu çavê mi girêdi tu heri têkevi golê îja ez ê çavê te girêdim ez ê têkevim golê. Keçik êvarê tê mal dibê qîza mi te çerkir? dibê welle baba dibê xwa mi ji mi ra wa go.

Rok du ro sê ro çar ro sê sal çar sal û va lawka bavê wan herd deri bajêr berê kî biçya tiştê salê dikirî, niha mesela utîya me diqedî, vana deri bajêr bavo dibin birê hev û sîyarê ma Paşê hebû ê Qeregeçîya hebû ê Bûcaqlîya hebû berê talan dikir. Û

keçik(şaştî tê gotin), lawik dibê dayê, xêri keçê çer bû? Dibê law xelkê pez û dewarê me gi bir ê dibê dayê keçê ez ê heya qametê pîrek bim çekê mi derxi, çeka li xwu diki û şûr û mertalê xwu sîlih i çî yi, diki destê xwu û derdikevi û sîyara dikevi sîyara gişî ser û binê hev diki û talanê xwu vedigerîn ji wê da tê. Mêrik tê dibê va talana kê anî çî çerbû çito bû? Dibê welle, Mêrik dibê haho li mi va çend sal i qîza mi jina vî mêrkî yi yarebîm va çî bû hat serê mi.

Mêrik malê xwu cîda nîvî dibi nîvî dihêli deri welatê xwu lawik cî da nexweş dikevi keçik cî bi rê da nexweş dikevi. Wer ji hev hezkirini xweyîngê hev in wer cem hev da radikevi (yaw ma ma mesele yi derew i ma cem hev rakevi peya ayrî yi yanê pîrek û peya mîna cêyanê yi bigê hev ma mesele yi ne tu îna biki ne e, pêşiyê me gotîyi ez ê jî ji te ra anlatmîşkim) va her nabi law, dibê ez ê dîn bim dayê dibê deva malla bavê Alyê yeki gewr i dibê wîya bixemilîni bi kulava tode çêdikir, tode çêkira pênc pîrek şeş pîrek diketê diçû zeyî, diçû, zeyî diçû, daweta deve li dû hev rêz dikir berê taqsî maqsî tunebû.

Todê çêdiki dibê du sala ra nanê mi ava mi têkê e ku mirim ku mam teselîya we bira ji mi da ketibi mêrik hefsalê devê bera ser didi dibê heywan, dibê devê pir baqil i tu heri mala bavê Alyê guhera te li ku yi heri wira. Va deri bi mehekê du meha sê meha di rê da deri gi salkê deri dernexûngê(?)

Serwanê mala bavê Alyê dineri bavo deva gewr i û va hat la deri dineri mêrik nexweş i hal xirab dibê law Alya çere yi, dibê welle Alya jî nexweş i, hal xirab, law dibê heri bira bîni her hevdu bibîni belkî xwedê rihê me bigri em herdi di cî da bimrin va deri dibê xatûn dibê Alya bira derkevi bayê xerbî merbî hinkî bavê ser çava xwi heya guhera deva bim, guher dêmeg yanê mîna tim li derekê heywan tim mexel dibi wira dibi guher, û ji birê xwu ra bêm, gi Alyê ji hundir derdixi dibê keçê va yi birê te hat, ser hev da digrîn, hev tê û Alya li wir rehet dibi Mihemed li wir rehet dibi. Keçik dibê bavo welle lawik va yi hatîyi diha tê mi bidê diha ez ê vî lawkî bikim ê mêrik dibê tê biki biki. Mêrik dibê bavo dibê yanê e jî xwedîyê malê me. E xwedîyê eşîrê mi, e mala te nanê te naqedi zikê mi jî naqeti. Tê çî bidi Alyê bidê zatî te nîvê malê xwu jî ji me ra hiştî yi, ez ê herim welatê xwu, ê mêrik dibê tu deri heri lawê mi, jinik dunya

guzelî yi kekê xwu ra bibêm gorî wî çend peza didê hespekî didê du hespa didê gi çî didê bar diki û bi rê dikevi. Ne qamyon i ne niha teyare sîyar dibi, heri sê seata da deri Almanyê. Têê di gundekî şên datîni (tu dibê navê gunda mebê mebê; wek şirove dikira bi min re biaxivîya).

Li gundekî şên datîni xwedîyê gund jî pir histûr bûyi, dineri jinik dunya guzelî yi. Mîna eletirîkê yi, jinek wer rindi, yek lê dineri. Dişîni pêy dibê bira weri, law mêrik dibê e ji xwa mîvan im, karê mi çî yi ez werim, e nan û ava xwu dixwim, e nayêm, werim çî? Rok du to rûdini dibê ez ê barkim herim. Mêrik dibê, ji peyê xwu ra dibê vî mêrkî wenda bikin, ez vê jinkê bigrim, mêrik jî diha fam diki diki bi zorê jinkê jê bigri. Û vana, Nazîyê(Nîyazî) xwu ra bêm, dibê wele dibê em ê îşev bavê ser gundekî em ê her talanê wan tê bi me ra weri. Law mêrik dibê ez xerîb im gundê we şên i karê mi çî yi e bi we ra werim, ma e vê mala xwu vê jina xwu li ku bihêlim?

Dibê tê heq neheq weri, ya tu tê ya em ê te bikujin. Dibê çî hûn mi dukujin bikujin la ma ma, mêrik zani diha çerbixi xerîb i. Jinkê ra dibê tu û namûsa xwu, e namûsa te teslîmî te dikim. Û mêrik li hespa xwu sîyar dibi, û van ra deri bi şev bi rê derin pir derin, jinik xînçerê digri û a jahrê bera nav qedihê diki datîni, xwedîyê gund ra, tu nêzîkî mi bi ez ê xwu kêr kim û jahrê vexwim. Dibê ne eşîrin law ma çerbûyi e rindim rindim ji mêrê xwu re rindim. Ma çar jinê te yi ma tu diki çerbiki xêri te? Berê were bûyi kî axa ba kî şêx ba, çar pênc ewê wî bû, bi zorê ji xelkê dibir.

Law dibê em rê da vî mêrkî çî bikuji gunê vî mêrkî çî têki hustûyê xwu, xerîb bextreş, dibê Mihmet Xerîb dibê a tu diki heri xwu bîrê da berdi hespê me avdî, yaw dibê ez ne bîrê nasdikim, welatê we yi ez herim hûn çar pênc sîyar in hûn herin, me gotîyi tî yê heri. Mêrik go ez zanim ez nerim jî hûn ê mi bikujin ez herim jî hûn ê ê bikuji. A diheri bîrê pezê wan av, dewar hespê wan gi çîyê wan av didi û kekê xwu ra bêm çaxa diki derkevi kêrê didi dewlê mêrik dikevi, dikevi bîrê vana bîvla mîvla xwu xûn diki ser meytê wî didi gi sêrî ji Alyê ra dibi bê welle mêrê te min. Û axa dorê ra deri û tê. Dibê heyra mêrê mi du sala sê sala ez te bikim û sê sal nebû ma e te çî bikim? Miramê xwedê sar i jinik bi hamîle yi, Karwankî şên tê ser bîrê, bîr dêmeg sarinc dêmeg, te sarinc dîyi ne dîyi? Xelkê bi mermera qasî vî hundirê me tim tije ava baranê

kirîyi, av tunebû kahnî tunebû sontaj tunebû berê, ban dikê bi dewlê digri dibê dibê ez bazirgan ra dibê gi ez pez û dewarê we av dim, av bîra min i. Bîrê da mi, ez dewl ez avê nadimê, hûn ê mi derxin, mêrik serê xwu diki bîrê dibê bi sozê mêrê berê bi tu dewarê me av di tiştê me, em ê te derxin, mêrik dibê korîcax i sermîyanê wî konî yanê axê eê wî bazirganî, dibê can bi ji min ra mal bi ji we ra, ji mîletê xwu ra dibê, derdixi law çi peya yi law çi xortkî xweş i haho, dibê lawê mi e bavê te tu lawê mi tu mi qebûl diki, dibê erê ez qebûl dikim, dibê ez qebûl dikim.

Dibê e qebûl dikim, va sîyarara dibê hevalê wî na dibê va qe daqa zewacê naki la em vî bizewicînin. Dibê wele e nazewicim qala zewacê naki. Vana rokê tim înyê berê înyê mîna eydîyê bû, ê kes nediçû palîyê nediçû kar her kes çekê xwu dişuşt serê xwu dişuşt şîvê rind ba dixwar ya mîvanê bîçereran Qerqelîyê biçîya gunda, daweta înyê rîya înyê, kekê xwu ra bêm tê gundkî mîna gundê me şên i. Yek keçek wer xweş i dinya guzelî yi, bi teyšê bi a wa mîna mewa xûyi wa filan meywa bûyi. lawik dibîni dibê keko tu hinek av nadi mi? Peyabi ji xwa ava xwu vexwu e te ne nas dikim ne te bas dikim ava çi bi tedim, e pîrek tu peya çira avê bi te dim.

Avê nadê e jî avê venaxwi bi hevalê xwu ra dibê bavê mi ra bê bira mi ra bira keçekê bixwazi. Keçekê diwazi va dibê av nedayi mi ez ê heyfa xwu jê bigrim. Gi doxîna mi biqeti ez ê mahr bikim, gi doxîna mi neqeti e mahr nakim. Va dixwazi tê yek li wir raketîyi, keçik hazirîyê yi, ne deng ji lêwik tê ne ji keçekê tê, pîrek xerîb i bê çi feqîrêî çel royê wê diqedî ji bavê xwu, bavê wî dibê lawê mi vê jinka xwu bibi zeyîki ha, edeta dinê wayi. devê todê çêdiki û keçik dilê wî tê de heyî ma îşê peya yi, em bê deri kortekê deri kortekê hine birek sîyar derkê tê berê were bû. Û va sîyarana dibê hadê em heri va çi durbîng i he gi çî yi?

Wa ye reşek deri deri jinkek kûbekê derdikevi. Dibê ka em em ê mêrik û bikuji) ji xwa vê jinkê bigri. Jinik bi hev ra qîsa naki, jinik tim mêze diki lawik dibê la va jinka li çi mêze diki, mêrik mêzediki çi mêzeki bavoo 40-50 sîyar û ji wê de tê, va hima mêrik rehet hespa xwu digri û dikevi nav, sîliha wê çaxê şûr bûyi, mertal bûyi çi bûyi se mêrik vê dikevi gişa bi erê ra diki û çend hesp mespê wî gidri bende dixi û tîni. Xwezûrê wî dibê lawê mi va çî yi? Dibê welle va zeyîya keçekê yi bavê mi şandîyi.

Tew nabê mi lec kirîyi ya xelk hatîyi me keçik dern cem ga xwe, ez hîn qîz im, mêrik ez mahr nekirim. Dibê rîya bavê wî da birîm, em ê te bidin pismamê te, (wê çaxê qonax a mîna va qonaxana bû her der çîmento bû, mişk lê nedigerîya filan lê nedigerîya ti zani?

Kekê xwu ra bêm mêrik dibê şêrik tê nav medreba me xezûrê wî dibê ez ê ji we kê ra bêm heri, meri, em ê vî zavê xwu bişîni gi namûslî bi, xelk i, meri ez ê herim, qirqirê diki lawik dibê xêri apo çî yi dibê?

Berê mera xwezûrê xwu ra digo apo ya bavo ya filan. Dibê welle he gi hurç i, şêr i tê medreba me erdhêra gi kî deri me dixwu dibê gi tenekê tu lê xi ew ê birevi. Tenekê lêxi, û va dibê ez ê herim ma tu çito heri, mêrik dibê cewher di vî lêwkî heyi hima û keçik dibi diki qonaxê û lawik şûrê xwu digri deri ber merê(medrebê) tekeke lêdixi. Hirç i şêr i çî yi tê û tê tèn hev tèn hev, mêrik şûr çer davê dini qûlê lêdixi wî heyvanî dikuje û didirû û xwu bêr radikevi keçik jî didi pismamê wê û mişkek jî ji qulikê derdikevi û awa derevi, çer sola xwu tê wer diki dibê ez kilê çavê te mi jinik dibê mala mi şewitî, dibê çel sîyar bû gi di erdê ra kir hesp anî bavê mi ra dibê gotîyi yanê bavê mi ji ta va hespana ji ta şandîyi. Zeyîya jinkê yi nego e kilê çavê te mi, dibê ez herim bira wa heywana bira mi jî bixwi, dibê niha mêrik mirîyi.

Keçik rîya medreba bavê xwu zani dikevi rê deri, xwu(xwey) bavo li serê medrebê va yi mêrik raketîyi kurk û ebê xwu kişandîyi serê xwu û keçik li doxîne dixebiti mêrik şûr dikşîni, dibê tu kî yi? dibê welle e jina te mi, ê dibê te yê rîya ewil da li doxîna mi bixebitîya, dibê amac çî bû te e mahr nekirim, dibê wexta mi av ji te xwest te av neda mi dibê mi go ez ê heyfa xwu ji te bigrim.

Dibê welle e jî di rîya ma avê xwu da birîm, mala bavê mi te şand vira gerek ti bihata kuştin, dibê e dam pimamê xwu, dibê pismamê mi sol li mişk wer kir, go e kilê çavê te mi dibê te pence sîyar li erdê ra kir, te nego ez kilê çavê te mi û te wa hespana anî mala bavê mi te nego mi lec kirîyi va hespana girtîyi û ez hatimi bira şêr mi jî bixwi, li wira daweta xwu diki li hespa xwu sîyar dibi berê xwu didi tê mala bavê xwu. Ji bavê xwu ra dibê bavo dibê ez ê qasî 15-20 rîya gunda bibim ez ê heya derkê herim werim.

Va li hespa xwu sîyar dibi tê vî jina vî ya berê jinik û lawê xwu, jinik û lawik ji xwa li cem hevi. Lawkê jinkê yi lawkekî wer rindik i dunya guzelî yi mêrik tê dibê, dipirsi yanê jinek wakîno xerîb mala wê li ku yi? Dineri fewqîr i wa yi, li wê ortê yi deri.

Dibê ez ê îşev mêvanê we bim, bira mîvanê me bi. Jinik dibê va tintên bavê te yi em ê bipên va jî dibê bira rakevi ez ê herda ser hev da bikujim herim mala xwu. Jinik dibê bavê te çaxa gi rakevi piştta xwu tahzî diki xwu didi êr, nîşanek wa reş li piştê yi, li pîyê rastê yi he gi li pîyê çepê yi û dipên, mêrik çî zani mêrik waxta diki, dibê ez xwu germ kim ez ê herda ser hevdu serjêkim yalla û were xwu didi êr, lawik ban ga xwu diki dibê dayê rabi, eyn ew ê gi ti dibê werkîno yi nîşana wa lê yi, û her direvi ser direvi ser mêrik şûrê xwu dikşîni, dibê va kî yi niha te bera cem xwu dayi min ê hûn herd ser hev da jêkira dibê welle lawê te yi tu çû dû te ra xwedê va lawa da te, ê dibê ma da gi lawi mi ni gerek nîşana mi lê hebi dibê eyn ew nîşana te li piştê bû piştta wî lawkî jî heyi. Lawik tahzî diki rast i eyn nîşan li piştê heyi. Ê hima hima mala xwu bardiki û derivi, jinik dibê bê te kes nêzîkî mi nebûyi, direvi diheri wê jinka xwu jî digri û tê cem bavê wî û dê ya xwu. De mîratê mersele, qise zû tişt digê me. A mesele wekîno yi keko.

## ENCAM

Di vê xebatê de, me li gor armanca xwe di mijarên dîyarkirî de keresteyên berhevkirî di hin serenavan de nişan kir.

Weke me bere jî behskiribû, ev xebat parçeyek ji monografîyê ye, lê ji ber kêmasîya derfetan ev xebat bi giştî ne xebateka monografîyê ye. Me ev xebat li ser heft beşan amade kirîye, bi awayekî giştî di derbarê gund de, li ser jîyana çandî ya gund, li ser kevnoşopîyan, rojên taybet û zîyaret, urf û edetên gund, li ser tibba gelêrî û lîstikên zarokan, di derheqê tibba gelêrî de, di derheqê nexweşîyan de, li ser lîstikên zarokan, ji edebîyata gelêrî hin çîrok û meselêyên di civatê tê tê behskirin hatine berhevkirin.

Bi vê yekê re bi rengekê berhevkarî di çarçoveya keresteyên folklorîk û çandî de lêkolîn hate kirin li Gundê Qereqoyinê ye bi navçeya Sêwerekê ve girêdayî. Li ser vê yekê gehîştine agahîyên derbarê jiyana gelêrî ya vî gundî û agahîya me çêbû ku jiyaneke çandî ya dewlemend tevî hemû tesîrên jiyana nû berdewam dibe.

## ÇAVKANÎ

Bilgiseven, Amiran Kurtkan, Köy Sosyolojisi, Weş: Filiz Kitapevi, İstanbul, 1994.

Celadet Bedirxan, "Ferhengok", Hawar, j. 30, Şam, 1941.

Ekinci, Metin, Halk Bilgisi(Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri, Weş: Geleneksel Yayıncılık, Çap V. Ankara, 2013.

Keskin, Necat, Folklor û Edebîyata Gelêrî, Weş. Avesta, Stenbol, 2019.

Keskin, Necat, Zêrka Zêra(Cureyên Edebîyata Gelêrî Ji Derodora mêrdînê), Weş. Avesta, Stenbol, 2019.

Örnek, Sedat Veyis, Türk Halk Bilim, Weş: Kültür Bakanlığı Yayınları, Çapa II., Ankara, 2000.

Yıldırım, Kadri; Pertev, Ramazan; Aslan, Mustafa, Ji Destpêkê Heta Niha Folkloru Kurdî, Weş. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, 2013.

<https://nisanyanmap.com/?yer=33158&haritasi=karakoyun> (03.01.2023)

[https://tr.wikipedia.org/wiki/Karakoyun,\\_Siverek](https://tr.wikipedia.org/wiki/Karakoyun,_Siverek) (03.01.2023)

<https://www.google.com/maps/place/Karakoyun,+63600+Siverek%2F%C5%9Eanl%C4%B1urfa/@37.6843152,39.2172663,1602m/data=!3m1!1e3!4m13!1m7!3m6!1s0x40758047b940eb6b:0x94975df9d638b939!2sSiverek,+63600+Siverek%2F%C5%9Eanl%C4%B1urfa!3b1!8m2!3d37.754104!4d39.317716!3m4!1s0x1534d15d399d8bcb:0xe119ab48cafcd404!8m2!3d37.6882694!4d39.2182517?hl=tr-TR> (03.01.2023)

### **Agahîyên kesên hevdîtin pê re hatîye kirin**

1. Xecê Bîrgün, jin, 53, bêkar, dibistana seretayî,
2. Riho, k, jin, 55-56, bêkar, tuneye
3. Emo(Emîne), Delen, jin, 68-70, bêkar, tunuye
4. S. Ö. Jin, 65-66, bêkar, tuneye
5. Z. H. Jin, 45-46, bêkar, dibistana navîn
6. E. D. Jin, 55-57, bêkar, dibîstana seratayias
7. Mahmût, Delen, mêr, 97, cotkar, tuneye
8. Mahmût, Tûm, mêr, 64-65, dibistana seretayî
9. Serhat, Evren, mêr, 27, xwendekar, zanîngeh
10. M. E. Mêr, 33, akademisyend, doktora dike
11. Şêxmûs Bîrgun, 29, Cotkar, dibistana navîn

## PÊVEK

Wêneyên di derbarê gund de



<https://www.facebook.com/photo/?fbid=107679170281652&set=a.107679190281650>



<https://www.facebook.com/gdsfh/photos/a.733777603303726/733777639970389/>

Ji bo cihê bilind re Pala Xirbe(hüyük) tê gotin.



<https://www.facebook.com/346439955455697/photos/a.360747237358302/404510236315335/>

Wêne 2013, cihê ku Pala xirbe derbas dibû ew der e û pembo hatîye çandin.



<https://www.facebook.com/346439955455697/photos/a.360747237358302/361140473985645/>



Ev dîmen beşek ji gundê Qereqoyinê ye, di 2021an de hatiye kişandin. Wêne: Argeş Bîrgun



Ev dîmen di 2022an de hatîye kişandin. Wene: Argeş Bîrgun




Xecê (Hatîce) Bîrgun, nane tîrê lê dixê.

Wêne: Argeş Bîrgun



1980-83, ji govendên bere, dema def diseqinî bi devkî stranên dawetê dihat gotin




Wêne ji 1980yê wisa ye, jinên gund ji ser bîr av dikşînin.

Wenê: Hasan Karaalp



[https://www.facebook.com/Bitlisnamecom/posts/2110569279043450/?locale=tr\\_TR](https://www.facebook.com/Bitlisnamecom/posts/2110569279043450/?locale=tr_TR)

Ev dîmen di salên 1980yî de hatîye kişandin, di çîwalan de sergîn hene. Sergîn ji cihê dewar lê çêrîyane hatine komkirin.



<https://maps.google.com> ê hatiye hatiye girtin. (03.01.2023)



**T.C.**

**MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ**  
**TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Tezsiz Yüksek Lisans Projesi**

**SİVEREKE BAĞLI KARAKOYUN KÖYÜNDE**  
**FOLKLOR UNSURLARI DERLEMESİ**

**Argeş BİRGÜN**

**21721008**

**Danışman**

**Doç. Dr. NECAT KESKİN**

**Mardin-2023**